PolitikART

KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

11 Cotmeh 2025 Şemî

HEJMAR : 343

Vegerandina kerameta barbaran



Ji edîtor

Di vê hejmara taybet a PolîtîkArtê de Luqman Guldivê bi meseleya weke 'hov' avakirina Kurdan dadidikeve û dixwaze weke pratîkeke dekoloniyal rûmeta van 'hovan' li wan were vegerandin. Ew ji bo vî karê xwe bi belgeyên dîplomatîk ên sefîrê Fransayê li Stenbolê yên ji 1838'an heta 1753'yan daket. Ew dibêje, di van belgeyan de weke tehlûke, eşqiya, diz avakirina Kurdan encamên giran ji bo Kurdan bi xwe re tîne. Ji perspektîfa xwedîderketina li xwebûna xwe, ew pêşniyaz dike ku kerameta van Kurdên ku li gorî belgeyên dîplomatîk ên Fransî yên sedsala 18'an, li navbera Skenderûn û Helebê serê Fransiyan êşandine, li wan were vegerandin. Ji bo xurtkirina vê xebatê, ji bo vê hejmarê helbesta 'Li benda hovan' a helbestvanê Yewnan Kavafîs —her wiha Cavalfy— jî bi destê Dr. Murat Issi ji Yewnanî ber bi Kurmancî ve hat kirin. Di heman çarçoveyê de ji bo xurtkirina argumana vê nivîsa sereke, Luqman Guldivê bi serhatiya Memo yan jî Memê û Eyşê daketiye û hewl daye rola dewletê di avakirina trajedî û felaketan de bi vê nimûneyê zelaltir bike. Ev hejmara taybet, tevî rexneyên nivîskar li rêbazên lêkolînên zanistî yên ji rêûresmê, bi vî awayî tevkariyek e ji bo lêkolînên dekoloniyal ên li ser Kurdan û Kurdistanê.

PolitikART

Herausgeber: *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Frankfurter Str. 181, 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özlem Cakar **politikart@yeniozgurpolitika.org**

Avakirina Kurdên eşqiya di nivîsên dîplomatîk ên Fransî de

Avakirina hov û barbaran ji berê ve ji wan amûran e ku pê navendên desthilatê xwe di peywendên koloniyal de rewa dikin. Bi koloniyalîzma jirêûresmê ya ji dawiya sedsala 15'an ve ev avakirina barbaran ji wan amûrên stratejîk e ji bo parçekirina dinyayê ya li ser esasên spî û ne spî, xirîstiyan û ne xiristiyan.

Luqman GULDIVÊ*

"Ka zarokino behsa bajarê xwe bikin!" Mamosteyê cografyayê di sinifa 2'yan a dibistana navîn de ev daxwaz ji me qederê pêncih zarokên di sinifê de kir. Tişta hate bîra me, bi nezanîna me ya hêviya mamoste ji me, Sûka Qaçaxçiyan, Pira Eleman, çandina pembû, bendava bajêr bû, hew tê bîra min kê, lê yekî ji me bîra Mazilevdîn û Mar Yaqûbê jî bir. Mamosteyê ji Bursayê li me nihêrî û ez îro çêtir fêm dikim, çima li me wiha bi dilovanî dinihêrî. Ew mamosteyê ku bi rêyên lêdanê yên ecêb dizanî, dixwest me hînî tiştekî bike ku hingê me bîra wê nedibir. Em li welatê xwe bûn û yê xerîb ew bû. Wî dest pê kir û behsa bajêr kir, rêya ku weke heybinûyekê her du serê wê digihîjin Îpekê —navê ku me hingê li rêya hevrîşm dikir— banên ku havînan bi text û ew cawên spî yên weke çîtan text ji xelkê dora xwe vedişartin, xweş dihemandin, kolanên teng ên havînan ax û toz, zivistanan herî, cîrantiya wî li Bursayê qet nedîtiye, çanda goristanan a li gorî wî 'ecêb' û 'insanî', zarokên tazî dikevin cokên avê, seyrangehên ku piştî bi du sê salan veguherîn taxên bajêr, nêrgizên biharan li ser tebleyan dihatin firotin û xaniyên kevnar, gelekî kevnar, ew xaniyên ku beriya li Bursayê insan peyda bibin li Girnewasê hatibûn avakirin.

Piştî ku gotinên xwe qedandin, çavên wî hîna li me bûn. Em xweşik bernediketin ka ew çima behsa van dike. Wî got, "gava ku dewletê ez şandim vir, xelkê ji min re digot, tu wê biçi wan deran, ew deverên xelk di şikeftan de dimînin, xaniyên wan nînin, hov in û heta hinekan digot, teriya wan heye û vedişêrin." Wî dewam kir û got, "bajarê ez hatimê, bi her awayê xwe ji bajarê ez jê têm insantir e." Xwedê dizane insantir bû, lê ew bajar wê piştî 1992'yan bi kuştinên bi destê 'sofîkan' —navê ku xelkê Nisêbînê hingê li endamên Hizbullahê dikir— carekê bimira û careke din jî sala 2016'an bi destê wanên ku weke wî mamosteyî ji bajarên rojavayê Tirkiyeyê dihatin, çekdarên dewleta Tirk, bi temamî xira bûya, bihata kuştin. Meseleya min ne bajarkujî —urbîsîd— ye, lê avakirina hovan e.

Lê bi raya giştî —bi maneya raya giştî ya sereke—, ne ew mirov û bajarên dihatin kuştin, lê yên ku ew bajar dikuştin insan û şareza bûn, Nisêbîn û xelkê wê hov û ne insan bûn. Kê Nisêbîn û xelkê wê weke hov û barbaran ava kirin, çima? Ev pirsek e ku bi ya min divê em xweşik pê dakevin. Min ev anektoda hanê bi kar anî, ne ji bo bi Nisêbînê dakevim, lê ji bo ku bi avakirina hov û barbaran dakevim. Ez ê li avakirina weke hovan a Kurdan bi destê dewleta Tirk a nû Komara Tirkiyeyê jî danekevim, lê bi nivîsên sefîrê Fransayê yê stenbolê yên sedsala 18'an ez ê berê xwe bidim vê avakirina weke hovan a Kurdan.

Bila ev destpêka bi anektodê jî rexneyeke li zimanê zanistî yê hişk be ku vegotina ragihandina

Li ser wêne dinivîse ku ev Kurdên Osmaniyeyê ne. Kesê wêne girtiye jî G. Mirahi yê ji Edenê ye. Em ji kitêbeke din hîn dibin ku ev wêneyê ji sala 1919'an ê giregirên Kurdên Elewî ye ku di pêşbirkan çandiniyê ya Osmaniyeyê di 4'ê Çiriya Paşîn a 1919'an de hazir bûne. Em texmîn dikin ku ev Kurdên ji Mereş, Meletî, Semsûrê bin.

zanînê di strukturên xwe yên hişk de asê dike. Lê em xweş pê dizanin ku bi sedên salan serhatîbêjî û çîrokbêjî jî bi kêr hatine ji bo ragihandina zanînê û nexasim jî rexneya miletên xwecihî li zanistê ew e ku bi vê qîmeta rêbaza storytellingê —gotina çîrokan/serhatiyan— nezaniye û heta bi qest ev rêbaz bêqedr û qîmet kirine. Ez xwe dûrî vê rexneyê nabînin û di destpêkê de be jî dixwazim wê îfade bikim.

Lê em li meseleya weke hov avakirina Kurdan —di anektoda li jor de Kurdên Nisêbînê— vegerin. Avakirina hov û barbaran ji berê ve ji wan amûran e ku pê navendên desthilatê xwe di peywendên koloniyal de rewa dikin. Bi koloniyalîzma jirêûresmê ya ji dawiya sedsala 15'an ve ev avakirina barbaran ji wan amûrên stratejîk e ji bo parçekirina dinyayê ya li ser esasên spî û ne spî, xirîstiyan û ne xiristiyan. Elaqeya avakirina barbaran bi avakirina qîmetê kolonan û bêqîmetkirina mêhtingehkiriyan re jî heye. Jiyanên hêja û yên ne hêja li ser çi ava bûn ku tevgerên weke black lives matters dikarîn peyda bibin!? Bêdengkirina sîstemîk a mêhtingehkiriyan û sîstema deshilatê a global a ku xwe disipêre wê, her awayê newekhevî û neheqiyên civakî —hilberandin û mêhtina zanistê jî di navê de—, aborî û ekolojîk jî sereqet û bênavber hildiberînin.

Ez dibêjim, binavkirina weke 'bahozeke modern' a vê dinyaya encama avakirina koloniyalîst, eynî weke ku Malcom Ferdinand dike (2019: 12) pirr di cihê xwe de ye. Ew di heman demê de balê dibe ser avakirina xelkê 'Caraibe' —yanî xelkê ku pêşî giravên Karaîbê şên kirin— weke hov û kanîbalan (ibid.). Ev yek, avakirina Kurdan weke millet di Şahnameyê de jî tîne bîra me: Ewên ku li serê çiyayan dimînin û qet li bajaran bi cih nabin, ewên bi konên xwe yên kejî bar dikin û 'ji xwedê natirsin' (Firdausi 1905: 147).

Ferdinand ev navê bahozê ji berhemeke edebî ya William Shakespeare girtiye. Di heman berhemê de karakterê Caliban heye. Caliban di berhema Shakespear a bi navê 'Bahoz' yan jî weke bi Ingilîzî The Tempest de me li wê bahoza modern a li jor vedigerîne. Caliban —Kalîban bixwîne— yek ji anagramên ji bo kanîbal —goştxurê nifşê/cûreyê xwe— e û di berhema Shakespear de bi temamî weke antîteza çandê hatiye avakirin (me ji vê çapa Inglîzî sûd wergirt: Shakespeare 1970). Jyontsna G. Singh vê berhema ku sala 1611'an cara pêşî li ser dikê hat nîşandan, di peywenda koloniyalîzmê de bi cih dike û wê weke encama efsaneyeke ku Colombus di rojnivîskên xwe de ava û belav kir, dibîne (2003: 206). Ew ji ber Eric Cheyfitz îfadeyeke gelekî bi tesîr digire ku nîşan dide ka çawa ti delîlên Colombus bi xwe jî tine ne da ku îsbat bike ku ew eşîra kanîbalan a ku ew weke goştxurên insanan behsa wê dike, bi rastî û jidil jî goştê insanan xwaribe. Heta di wê pasajê de Cheyfitz nakokiyên Colombus jî eşkere dike, lewma Kolombus ê ku dibêje, wî agahiyên xwe ji eşîra Karaîbî ya bi navê Arawakan girtine, piştre jî dibêje, ne xwecihan —yên 'Hindistan'a Colombus— bi zimanê Ewrûpiyan dizanî û ne jî Ewrûpiyan bi zimanê wan dizanî (1991: 42, yê ji ber girtî Singh 2003: 206). Baş e, naxwe çawa xelkê Arawakan jê re gotiye ku Kanîbal goştê insanan dixwin?

Weke kirineke dekoloniyal vegerandina kerametê

Ji ber wê, encama ku Cheyfitz digihîjiyê ya ku dibêje, kanîbalên di rojnivîskên Colombus de ji bo Ewrûpiyan veguherî yekê ji wan sîlehên retorîk ên ku wan pê 'medenîbûn'a xwe û hin 'hovên' din ji hev vediqetand (ibid.), têra xwe xurt e. Jixwe ma helbesta Konstantînos Kavafîs —Constantin Cavafy— ya bi navê 'Li benda hovan (1)' ji mêj ve salox dide me ku haya mirovan ji avakirina hovan û bikaranîna wan ji bo birêvebirina civakan û rewakirina tehekumê hebûye. Qet nebe ya Kavafîs heye. Hovên wî diyar e li bajarekî kevnar ên Romayê —dibe ku Roma bi xwe be— 'bi rengekî ji rengan çareyek'

Kavafîs bi helbesta xwe me di neqebekê de bi cih dike: Li aliyekî mirov li bendê ne ku 'hov' bajêr bistînin û ji bo sîstema teqinî ya di nava gemara xwe de bistbûyî, bibin çareyek, li aliyê din dibe ku ew behsa bikaranîna hovan bi destê desthilatan ji bo betalkirin û neçalakkirina nerazîbûna xelkê jî dike.

in. Kavafîs bi helbesta xwe me di neqebekê de bi cih dike: Li aliyekî mirov li bendê ne ku 'hov' bajêr bistînin û ji bo sîstema teqinî ya di nava gemara xwe de bistbûyî, bibin çareyek, li aliyê din dibe ku ew behsa bikaranîna hovan bi destê desthilatan ji bo betalkirin û neçalakkirina nerazîbûna xelkê jî dike. Bi her halî, ji ber ku "'bû şev û herçî hov in, nehatin" û "êdî hov nînin" ne çareya pêşî ne jî çareya desthilatan a duyem naçin serî. Hov —barbar—, amûreke bikêr in ji bo avakirina yên din weke tehlûkeyeke gelekî mezin, lê heger navê wan hovan hebe, hingê mirov çi bike? Û jixwe heger navê wan û yê me yek be, em ê çawa bikin? Gelo em ê qebûl bikin ew bi hovîtî —weke piçûkxistina wan û şikandina kerameta wan— werin binavkirin, yan gelo vegerandina kerameta wan, parastina kerameta me ye jî? Ez gotinên kerametê, vegerandina kerametê û parastina kerametê bi qest bi kar tînim, ji ber ku ez wan weke kirinên eşkere dekoloniyal manedar dikim.

Ewên ku weke hov tên avakirin, ew dikarin çi bikin? Helbet di peywendeke berfireh a çandî, wêjeyî û dîrokî de gelek bersivên em li vê pirsê vegerînin hene, lê ez ê di vê meqaleyê de berê xwe bidim nivîsên ku sefîrên Fransayê yên Stenbolê ji wezîrên elaqedar re şandine, binihêrim. Di van nivîsan de behsa konsolosên Helebê û cihgirên wan jî tê kirin. Mijara me tenê wê ew nivîs bin ku di wan de behsa Kurdan tê kirin. Gava ev nivîs behsa Kurdan dikin ew bi pirranî weke 'Kurdên diz' û 'dizên kurd','diziya bi destê Kurdan' û 'Kurdên tên sorkirin' di çarçoveyeke tehlûkeyê de qala wan dikin. Bi danîna peywendeke dîrokî û her wiha peywenda koloniyal a pirrtebeqeyî, ez ê hewl bidim ji van nivîsan fêm bikim ka çawa û belkî jî çima Kurd weke diz, talanker —bi maneya berfireh weke hov— hatine avakirin û berê xwe bidimê, ka gelo xwendineke din jî ne mumkin e. Çawa bi helbesta Kavafîs min bal bire ser, avakirinên hovan dikarin di pratîkên desthilatê û tehekumê de gelekî bi kêr werin, ji ber wê jî, peywenda dîrokî ya heyî belkî bi me re alîkar be.

Sîmbola me esas hov in

Beriya wê, ez dîsa li Singh vegerim, lewma wê ji fikrên Retamar jî sûd wergirtiye, yê ku dibêje, 'sîmbola me' bêhtir Caliban e. Retamar berê xwe dide berhema The Tempest a Shakespear û wê di vê peywendê de dinirxîne. Bi hizra wî, Prospero giravên dinya nû dagir kirin, pêşiyên wan —ên Retamar— kuştin û Caliban jî kirin kole. Wan zimanê xwe hînî Caliban kir da ku bikin ku ew jê fêm bikin (2). Di dewamê de ew dibêje, îro ji bilî vî zimanî zimanekî din ê Caliban —çêl li paşiyên xelkê giravên Karaîbê dike— nîne û wê bi kar tîne da ku nifiran bike li Prosperoyî. Bi ya wî ev metafora herî baş e ji bo îfadekirina rewşa çandî ya xelkê wî: "Ma dîroka me çi ye, çanda me çi ye, heger ne dîrok û çanda Caliban be (3)" (Retamar 1989: 14; Singh ji ber girtiye di 2003: 207 de).

Çima min behsa Retamar kir, belkî zêde ne zelal be, ez li vir zelal bikim: Vegerandina kerameta Caliban, weke sîmbol avakirina wî di peywendeke dekoloniyal de, vegerandina kerameta 'dizên kurd' û 'Kurdên diz' ew Kurdên hatine 'sorkirin' tîne bîra min, ew Kurdên ku weke hov hatine avakirin, tevî gelek nakokiyên di nivîsên sefîrên Fransî de jî. Bi ya min, vegerandina kerameta van Kurdan wê bibe ji kirinên dekoloniyal û belkî wêje, şano û sînema jî bi çîrokên ku wê bibin ji kirinên dekoloniyal, di vê peywendê de rabin.

Navê talanê kirin dizî
Xelkê çiyê kirin hov

Em li mijara lêkolîna xwe vegerin. Em behsa nivîsên sefîrê Fransayê yên ji 21'ê Tebaxa 1738'an heta 17'ê Çiriya Paşîn a 1753'yan dikin. Ji bilî wê Nivîseke konsolosê Fransayê yê Helebê yê ji sefîr re ya sala 1743'yan jî heye. Di van 15 salan de 17 caran navên Kurdan hatiye hildan û carekê jî navê Kurdistanê. Navê Kurdan hatiye hildan 10 caran elaqedarî diziyê —gava em li meselê dinihêrin em dizanin ku talan e—, 3 caran li ser rapor, wergerên rapor û nameyên karmendên Osmanî elaqedarî diziya Kurdan —ev hemû jî esas yek jê hewldan jî be sê bûyerên talanê ne, tevî ku carekê weke talan behsa yekê ji wan tê kirin wekî din ji van talanan re dizî hatiye gotin—, carekê elaqedarî bûyereke 'heqaretê', carekê elaqedarî meseleyeke 'parastiyên' Kurdan li Skenderûnê —bûyereke elaqedarî malbata Longy û meseleya Daniel e—, carekê elaqedarî hewandina tebîbekî winda —yê ku li gorî sefîr û konsul êdî dîn bûye—, carekê elaqedarî serketineke eskerî ya Osmaniyan li dijî 'Persan/Farsan'. Navê Kurdistanê jî li ser bipêşketina eskerî ya Nadir Şah sala 1744'an hatiye hildan. Ev belge hemû jî hatine berhevkirin ji aliyê Anne Mézin ve û bêyî guhertina ziman hatine dijîtalkirin û di arşîvên dewletê yên Fransayê de cih digirin. Me ji du bergên van berhevkirinan sûd wergirt (Mézin 2019a û Mézin 2019b).

Di vê demê de tenê navê sê kesên cuda weke konsulê Fransayê li Helebê hatiye hildan. Yê pêşî Delane e, yê din Joseph Arasi (herwiha Arazy û Arasy) ye yê ku heta bi sala 1745'an jî weke konsul navê wî tê hildan. Piştî wî jî em dibînin ku navê konsulê Helebê weke Thomas tê hildan. Di vê demê de tenê sê kes jî sefîrtiya Fransayê li Stenbolê dikin. Yek jê Louis Sauveur, markiyê (mîrekê) Villenueveyê ye, yekî din Michel Ange, kontê Castellaneyê ye û yê din jî Roland Puchot, kontê Alleursê ye. Muxatebên sefîran jî tenê du musteşarên deryavaniyê yên wezareta karê derve ne ku em ê weke wezîrên deryavaniyê li jêr navê wan hildin. Yek jê Jean Frédéric Phélypeaux, kontê Marepasê ye, yê din jî Antoine Louis Rouillé ye. Gava me li ber malpera arşîva wezareta karê derve ya Fransayê girt, me dît ku di vê demê de Léon de Lane —yê ku di metnan de navê wî weke Delane hatiye hildan— heta bi mirina xwe yanî 29'ê Çileyê 1742'yan konsuliya Fransayê li Helebê kiriye. Cihgirên wî ji bo demeke kurt Taupin û Routier in, lê Joseph Arazy esas ji Hezîrana 1742'yan heta bi mirina xwe 22'yê Adara 1745'an konsul e. Piştre ji bo demên kurt Aubergy, François de Lane, Dauphin, Estienne û Guien cihgiriyê dikin heta ku Pierre Thomas 17'ê Çiriya Paşîn a 1748'an dibe konsulê Fransayê li Helebê (4).

Ev gravura ku sala 1850'î hatiye çêkirin, eşîreke Kurd nîşan dide gava ku ji boreke Arasê derbas dibe. Kesa ku gravur çêkiriye Célestine Nanteuil ye. Jêder: gallica.bnf.fr / Bibliothèque nationale de France.

Peywenda dîrokî

Em ê yeko yeko bi nivîsên sefîran dakevin. Lê pêşî em bibêjin ka em behsa çi dikin. Peywendeke dîrokî ya elaqedarî hebûna Fransiyan li van cihên Kurd lê yan jî temasa Kurd û Fransiyan, wê meseleyê zelaltir bike. Li Skenderûnê ji sedsala 16'an û pê ve cihgirên konsolosên Helebê yên gelek dewletên Ewrûpî hene. Li gorî çavkaniyên sedsala 16'an, wan çaxan serjimara bajêr bi pirranî ji Ewrûpî (Frenk) û Rûman pêk tê. Di nava cihgirên konsolosan de yên Venedîkî, Fransî, Ingilîz û Hollandî jî hene. Bendera Skenderûnê weke skeleya Helebê dixebite. Bi her halî, ev dewlet hem ji bo malên dikirin û hem jî malên ku difiroşin ji bazaran bînin û bigihînin bazaran, bendera Skenderûnê û embarên li wir bi kar tînin. Ji ber ku li bajêr keleh tine ye, biyanî baca gumrukê nadin, lê çend malên wan, şapeleke ji bo Xirîstiyanan, mêvanxaneyeke ku Fransî bi rê ve dibin û depoyên ji bo parastina malan hene (5). Li Skenderûnê yên herî çalak Fransî ne û helbet elaqeya wê bi 'Kapîtulasyonan' re heye: Em behsa peymana Osmaniyan a ku îmtiyazên yekalî yên tîcarî dan Fransayê dikin. Osmaniyan ev îmtiyaz berê di sedsalên 14 û 15'an de dabûn Cenewîzî û Venede

Vegerandina kerameta Caliban, weke sîmbol avakirina wî di peywendeke dekoloniyal de, vegerandina kerameta 'dizên kurd' û 'Kurdên diz' ew Kurdên hatine 'sorkirin' tîne bîra min, ew Kurdên ku weke hov hatine avakirin. Bi ya min, vegerandina kerameta van Kurdan wê bibe ji kirinên dekoloniyal.



Nexşeya ku Şerîf Paşa li ser navê delegasyona Kurd, weke ku wî xwe dida nasîn yanî serokê wê delegasyonê (Président de la Délégation Kurde) dayî serokê Konseya Bilind a Konferansa Aştiyê ya Sevrê (1920) jî di ser Peyasê re xwe digihîne Skenderûnê, lê belê Kurdên Efrîn, Kilîs û Qiriqxanê nabîne.

kiyan (Turkmen r. 327-328) û ji 1528'an û pê ve ev kapîtulasyon dane Fransayê. Peymana esas, xwe disipêre wergereke bi Fransî ya metneke sala 1536'an a ku bi 17 xalan dest pê kir û bi lêzêdekirin û erêkirina padîşahên piştî Kanûnî Sultan Suleyman gihîşte heta bi '70-80' xalan. Paşê jî dewletên din ên ku ev îmtiyazên ji bo Fransiyan weke nimûne nîşan dan, wê ev îmtiyaz wergirtana (ibid.: 331-333).

Gelo hingê li Skenderûn û derdorê Kurd hebûn, tesîra wan çi bû? Me çawa li jor jî behsa wê kir, esas jixwe pirraniya nifûsa nava bajarê Skenderûnê wî çaxî Ewrûpî û Rûm in. Lê Kurd hema li derveyî Skenderûnê hene. Rêyên hatina depoyên bendera Skenderûnê û rêyên ku ji benderê ber bi Helebê ve di nava erd û eqarên Kurdan re diçûn: Peyas, Qiriqxan, Efrîn, Kilîs, Şehba. Heta Piştî hingê, yanî teqrîbeb nîvê sedsala 18'an navbera Skenderûn û Peyasê bi temamî di kontrola eşîrên Kurdan de ye û bi ser de jî temamê rêya ji Skenderûnê heta bi Kilîs û Entabê jî di kontrola eşîrên Kurdan de ye (Türkhan 2014: 87). Türkhan (2014) di teza xwe ya doktorayê de bi belgeyên ji arşîvên dîplomatîk ên Ingilîzan bi vê meseleyê dadikeve. Ew bi awirê ewlehiya rêya ticaretê ya di navbera Heleb û Skenderûnê de agahiyan li ser Kurdan dide û di van belgeyan de wêneyekî Kurdên talanker, eşqiya, diz ên ku rêya karwanan girtine, xweşik derdixe holê. Hewldanên hevdîtinan ên Osmaniyan bi eşîrên Kurdan re ji bo ewlehiya rê û yên dîplomatên Ingilîz ji bo tezmînkirina ziraran jî ji wan agahiyan in ku esas ji bo weke hov, diz, talanker, eşqiya avakirina Kurdan bi kêr tên. Bi her halî agahiyên wî nîşan didin ka Kurd hingê çi qasî bi bandor in li herêmê. Ji bo belavbûna Kurdan li heman herêmê xebatên Stefan Winter jî bi kêr tên (Winter 2005 û Winter 2017). Winter di meqaleya xwe ya li ser Kurdên li bakurrojavayê Sûriyê de behsa belgeyên Osmanî dike yên ku xweşik û bê şik û guman nîşan didin di sedsalên 16, 17,18 û 19'an de Kurd hem nifûseke muhim a deverê pêk tînin û hem jî bi eşîrên xwe ji hêzên eskerî û siyasî yên bi bandor in. Di meqaleya xwe ya vê dawiyê de ew esas behsa Reşwanan ji 1690 ta 1750'î dike, lê pê re jî gelek agahiyên Reşwanên li wilayeta Osmanî Reqayê û peywendiyên wan bi eşîrên din ên Kurd, Ereb û Turkmen re û peywendiya wan bi dewleta Osmanî re jî dide. Ev belge nîşan didin ku eşîrên Kurdan xwedî tesîreke diyarker in li herêmê. Bi her halî xebatên li ser belgeyên Osmanî hatine kirin ên weke Orhonlu (1963) jî giringiya Kurdan li deverê piştrast dikin. Lê dîsa jî gelek lêkoler, tevî ku Kurd weke nifûs li bakurrojavayê Sûrî li derveyî bajaran hêza sereke ne jî tevî Turkmenan, pirr kêm navê wan hildidin, weke nimûne em dikarin îşaret bi Raymond (1992: 93-109) bikin. Tevî ku ew navê Tirk û Ereban hildide, ew careke tenê jî di meqaleya xwe ya li ser Heleba ji sedsala 16'an ta 19'an de navê Kurdan hilnade. Ev yek, encameke eşkere ya siyasetên nexuyayîkirina Kurdan e. Em nabêjin nivîskar bi xwe parçeyek ji vê siyasetê ye, lê diyar e ku encama vê siyasetê kiriye ku nivîskar Kurdan nebîne û pê re jî bi xwe di meqaleya xwe de wan nexuyayî bike. Nexuyayîkirina Kurdan tiştekî nû nîne, em di tercîhên Firdewsî de jî wê dibînin. Me li jor nîşan dabû ew çawa behsa nemedenîbûna Kurdan dike. Lê em her wiha pê dizanin ku mîtolojiya li dora Kawa ya ku ew Dehak (yan jî Zohak) dikuje jî di Şahnameya Firdewsî de êdî tine bûye: Kawa dibe figurekî alîkar ji bo ku Ferîdûn bi ser bikeve. Lê çawa dibe ku alaya wî, alaya dawî ya Sasaniyan bû heger Kawa ew qasî negiring û bêqîmet bû? Li aliyê din li gelek aliyên Îranê, li derveyî Kurdistanê jî cejnên elaqedarî kuştina Dehak dihatin pîrozkirin. Heta, belge hene ku nîşan didin navên van cejnan li derveyî civaka Kurdan, weke 'Îdî Kurdî' dihat nasîn. Ji wergera xwe ya ji bo Şahnameyê re weke têbîniyê ji bo qismê li ser 'Zahhák', Arthur George Warner û Edmond Warner beriya bi bêhtirî 120 salan behsa cejneke bi navê 'Îdî Kurdî' dikin. Ew dibêjin, xelkê bajarê Demawendê —li başûrê çiyayê Demawend e— 'îro' jî vê cejnê pîroz dikin (Firdausi 1905: 143).

Mirov dikare bi sedemên vê nexuyayîkirina Kurdan bi lêkolîneke din dakeve. Lê di nivîsên dîplomatîk ên sefîrên Fransayê yên ji 1738'an heta 1853'yan de Kurd xuya ne, weke hêza eskerî, weke hêza ku dikare bandorê li rêyên bazirganiyê bike; di van belgeyan de ew tehlûke bin jî xuya ne û em ê li jêr bi wan dakevin. Jixwe, gava ew behsa Kurdan dikin, ew vê pêşteza me ji niha ve piştrast dikin.

Dewlet çawa abora eşîran xira dike

Nexuyayîkirin çawa dibe bila bibe, eşîrên kurd weke nifûs jî û weke hêza eskerî û aborî jî li bakurê Helebê hêzeke sereke ne. Ev eşîr carinan li gundan hatine bicihkirin, gelekên wan çandiniyê dikin û gelekên wan jî pez xwedî dikin. Yên pez xwedî dikin gelek ji wan koçeriya bi usûlê Kurdan dikin a ku esas transhumansek e: Germiyanên wan û zozanên wan diyar in. Vegotinên li ser Reşwanan (Winter 2017) li ser sînorê di navbera Sûrî û Anatoliyê de xweşik vê yekê nîşan dide. Baş e, çi qewimî ku xelkê van deveran berê xwe da 'dizî' û talana taciran û di nava wan de tacirên Ewrûpî jî? Ji bo vê, belgeyên Osmanî îşaret bi hin agahiyan dikin. Ev agahî bi rêya şiroveyên bi awirekî dekoloniyal destûrê didin em nas bikin ku destwerdana dewletê û belavbûna dewletê li nava erd û eqarên eşîrên Kurdan abora wan şikandiye û ew jî li alternatîfan geriyane. Stratejiyên eskerî yên Osmaniyan, di sedsalaên 17 û 18'an de gelek zilamên eşîran weke barhilgirên bi qantir û devehan wezîfedar dikirin di navbera Skenderûn û Diyarbekirê de. Yanî hem zilamên çalak û hem jî heywanên bi kêr ên eşîran ji wan distandin û gelek caran jî heqdestên wan nedidan wan (Winter 2005: 248). Wekî din jî diyar e ku abora xelkê bi hin tiştan xira bûye û yek ji van tiştan baca li ser heywanan e: Tenê eşîra Kurd a bi navê Qiliçli ji 500 devehên baca salane ya sala 1734'an a gundewarên Helebê bû, lazim bû 25'an bide. Navê eşîrê ji ser lîsteya sererastkirî tê birin (ibid.). Diyar e yan eşîr ji cihên xwe yên devera Cûmê digere weke gelekên din ku koçber dibin yan jî li koçeriyê vedigere, yan jî bi Osmaniyan re şertên nû mizakere dike.

Wekî din nimûneyeke din heye ku nîşan dide neparastina gundiyan beramberî Erebên bedewî jî ji sedemên xirabûna abora eşîrên Kurdan bûye: waliyê Trablusşamê dawiya sala 1700'î ji Bab-i Alî re nivîsiye ku Kurdên ji eşîra Saçlo ên jimêj li mukataa Hemayê bi cih û war bûne, ji ber êrişên sereqet ên Erebên bedewî dev ji erd û gundên xwe berdane (Winter 2005: 246). Siyaseta îskanê ya dewleta Osmanî jî tesîreke xirab li gelek eşîran kir. Osmaniyan dixwest hem azadiya eşîrên koçer ji dest wan bigirin, hem zexta hêza van eşîran li ser xelkê damanî kêm bikin û hem jî erdên beyar bixin ber cotkariyê û ji bo vê îskan ji sedsala 17'an heta bi nîvê sedsala 18'an li Reqayê —ji ber wê jî navê fermî Raqqa iskani ye— û Helebê pratîka xwe ya herî mezin a 'muhendisiya civakî' kir (binihêre li Winter 2020: 86-87). Projeya vê siyaseta îskana li Reqayê sala 1690'î dest pê kiribû (ibid.: 99).

Ev parçeyên agahiyan bi me didin zanîn ku siyaseta bacê û elaqedarî wê ya îskanê ya Osmaniyan, di sedsalên 17 û nexasim 18'an de li gundewarên Helebê û Reqayê jiyana eşîran serûbinî hev kiriye. Nimûneya dawî ya elaqedarî gundewarên Hemayê jî elaqedarî bacê ye: Dewleta Osmanî bacê ji gundiyan distîne lê wan li dijî êrişan naparêze. Sedema vê serûbinîhevbûnê û destwerdana dewleta Osmanî jî ew e ku Heleb weke bajar di dawiya sedsala 16'an û di destpêka sedsala 17'an de veguherî navendeke

Türkhan bi belgeyên ji arşîvên dîplomatîk ên Ingilîzan, bi awirê ewlehiya rêya ticaretê ya di navbera Heleb û Skenderûnê de agahiyan li ser Kurdan dide û di van belgeyan de wêneyekî Kurdên talanker, eşqiya, diz ên ku rêya karwanan girtine, xweşik derdixe holê. Hevdîtinên Osmanî û dîplomatên Ingilîz jî ji wan agahiyan in ku esas ji bo weke hov, diz, talanker, eşqiya avakirina Kurdan bi kêr tên.

bazirganiya navneteweyî. Vê tesîra xwe li aboriya hawîrdorê jî kir (Masters 2020: 131). Di heman demê de şerên sereqet ên sedsala 17'an bi Rûsan —her wiha bi Awusturya, Venedîkê— re jî kirin ku dewleta Osmanî ji ber lawazbûnê, hem deverê ne ewle bihêle (6) û hem jî gava dest werdida, bac distand û esker jê radikirin û ev jî tiştekî ji bo eşîran gelekî giran bû. Meseleya rakirina eskeran ji Kurdan, tesîreke gelekî xirab li jiyana eşîrên damanî û yên koçer ên kurd ên li Kilîs, Ezaz, Efrîn û bi giştî Heleb û Reqayê kir. Dîrokzanên tirk bi pirranî weke bûyereke erênî li meseleyê dinihêrin û weke peydakirina esker ji bo parastina Serhedan —serhedên Osmaniyan— di destpêka sedsala 18'an de şirove dikin (weke nimûne binihêre li Orhonlu 1963: 4), lê esas ev felaketeke mezin e ya ku gelek 'semyanên malê' di wexta wan a herî hilberîner de ji nava malbatên wan dibirin û hêza wan malbatan a aborî dişikandin. Jixwe di sedsala 19'an de jî em dibînin ku Kurdên li nav împaretoriya Osmanî de —"ji kîjan çîna civakî be bila bibe her Kurd"— ji du tiştan gazinên xwe dikin û ev her du tişt wan gelekî diêşînin: Standina bacê û birina eskeriyê (Moltke 1876: 277). Piştî bêkêrbûna Ocaxa Yenîçeriyan ji destpêka sedsata 18'an û pê ve, eskeriya ji dewleta Osmanî re yek ji zilmên herî mezin bû ku li Kurd û Tirkmenan dihat kirin:

Nûbûna sereke ya Fermana Tanzîmatê di warê eskeriyê de ew bû ku mohleta eskeriyê ya bêsînor, bi esasekî ve girêbide û veguherîne deynê welêt. […] Şikestên dewletê yên li meydanên şer ên li pey hev û rewşa aborî, girtina eskeriyê gelekî zehmet kiribû. Çi zewicî û çi jî azib, li wilayetan ciwan digirtin, destên wan li kelepçê dixistin û ew dibirin navçeya herî nêzîk a li ber deryayê. Li wir ew li bendê bûn ku kesên din jî li wan zêde bibin, heta hingê ew di nava qirêjê de hepsî bûn. Bi keştiyan ev ciwan dibirin Stenbolê û ji vir jî ew ji bo ku temamê jiyana xwe xizmetê bikin dişandin alayên artêşê û keştiyên şerî. Bi vî halê xwe xizmeta eskeriyê hinekî dişibiya cezayê mahkûmiya sekankişandina di keştiyan de.

(Şimşek 2006: 178)

Bi vî halê xwe jî bêguman eskerî ji wan sedemên sereke yên xirabûna abora eşîran jî bû. Ev bi serê xwe meseleyeke din a lêkolînê be jî em bi bîr bixin ku Kilama Memo bi trajediyeke malbatî behsa vê rewşê dike; Memoyê ku Osmanî muhtemelen bi zorê dibin eskeriyê û piştî bi salan vedigere, bi destê dayika xwe tê kuştin: "Jaro lawo, day kore bû, rim danî / Ay hay Memo, serim gihandî canî" (Binihêre li nivîsa li ser Kilama Memo ya di vê hejmarê de).

Hewldana diziyê yan serdegirtin?

Di peywendeke wiha de talan û serdegirtinên embar û karwanan, mirov dibe ku weke encama destwerdana dewletê binirxîne. Di rewşeke wisa de qerebokirina zirara li eşîran bûye, gava eşîr bi xwe bi rêya talan û serdegirtinan bikin, gelo maqûl e ku mirov tenê bi van navan û weke dîplomatên Fransî kirî, bi navên weke diziyê vê rewşê binirxîne? Bi çavê bazirgan û dewletan helbet. Lê gava xelk behsa dîroka xwe bikin, kî diz e, kî talanker e, ew ê ji nû ve karibin diyar bikin. Ev lêkolîn, gavikeke di vê biwarê de. Çima ev eşîrên ku talanên zirhêzên weke Fransayê rakirine, ne weke Elî Axa yan jî Elodîno yê Dorikî camêr bin (7)?

Em berê xwe bidin belgeyên dîplomatîk ên Fransayê yên ji sedsala 18'an û hewl bidin bersiva vê pirsê di peywenda dîrokî û civakî ya li jor ravekirî de bidin. Em pêşî berê xwe bidin agahdariya 21'ê Tebaxa 1738'an. Louis Sauveur, markiyê (mîrekê) Villenueveyê, sefîrê Fransayê li Stenbolê ji Jean Frédéric Phélypeaux, kontê Marepasê, wezîrê deryavaniyê yê Fransayê re behsa hewldana diziyê ya Kurdan li depoyên Skenderûnê dike. Yanî behs li ser embarên li bendera Skenderûnê ye. Li gorî agahiyê, 'Kurdan' di Tîrmeha 1738'an de hewl daye ku ji embarên xelkê —yên Fransayê li Skenderûnê— baliyên hevrîşm 'bidizin'. Wan bi tivingan gule li nobedaran barandine (Mézin 2019a: 777).

Diyar e ku ev mesele li Helebê, li konsulosxaneya Fransayê jî hatiye minaqeşekirin, lewma behsa konsulê Fransayê 'Delane' —ji peywendê em tê derdixin ku konsulê Fransayê yê li Helebê ye û esas navê wî De Lane e— tê kirin ê ku piştgiriya pêşniyaza wezîfedarê gumrukê yê Skenderûnê ya bicihkirina yekîneyeke mihafizên yenîçerî nake. Diyar e di nava wan mitaleyan de yên ku li konsolosxaneyê de behsa wan hatiye kirin, ya ne dûrî aqilan hatiye dîtin, avakirina embareke ji Kurdan parastî ye, ji bo wê jî bingehekî malî lazim e yê ku dikare bi baceke nû —serê baliyeke hevrîşm— yan jî bi xerceke qebûla mal a li embarê bê avakirin (Mézin 2019a: 778).

Tişta balkêş jî jixwe ev mitale ne, lewma ev mitale îşaret bi wê yekê dikin ku hewldanên biserketî yan jî biserneketî yên 'diziya' ji van embaran berê jî hebûne û ji ber vê yekê konsolos hem bi wezîfedarê gumrukê yê Osmanî û hem jî bi xwe di nava xwe de serê xwe êşandiye da ku çareyekê peyda bike. Di vê nivîsa li ser 'diziyê' de behsa Kurdan weke Kurdên diz yan jî dizên kurd nayê kirin. Li şûna wê bi awayekî bêalîtir "hewldana Kurdan a diziya baliyên hevrîşm" hatiye gotin (ibid.). Bi her halî, gava eşîreke Kurdan bi zilamên xwe yên xwedî tiving bi ser deverekê de bigire, ev yek helbet ne dizî ye. Heger ne tenê hewldan bûya û bi ser biketa jî, ew ê bibûya rakirina talanê Fransiyan.

Elaqeya Daniel û Longy bi Kurdan re

Di nivîseke 26'ê Adara 1743'yan de behsa Arasi —Joseph Arazy/Arasy/Arasi konsulê Fransayê yê Helebê— tê kirin. Wî paketeke li ser 'bûyera Daniel' ji sefaretê re şandiye —25'ê Adara 1743'yan paket gihîştiye sefaretê— û sefîrê Fransayê yê li Stenbolê Michel Ange jî wezîrê Fransayê yê deryavaniyê Jean Frédéric Phélypeaux agahdar dike. Di vê nivîsê de em tam pê nahisin ka ev 'bûyera Daniel' çi ye, lê di nivîsên paşê de em pê dihisin ku Daniel ji dînê xwe quliptiye, bûye Misilman. Cara ewilî di nivîsên sefîr de di nivîseke 20'ê Çileyê 1743'yan de navê 'bûyera Daniel' tê hildan û tê de navê bûyerê weke 'bûyera Daniel-Deslongi ya li Helebê' hatiye hildan. Ji ber ku 'Longi' gelek bira ne, 'des' jî artîkila pirrhejmariyê ya nediyar e di Fransî de ye, em dikarin bibêjin, bûyera ku paşê dibû bûyera Daniel, pêşî 'bûyera Daniel û birayên ji malbata Longy' bûye (Mézin 2019b: 63). Daniel bi fermanekê —ya siltan— û 'komîserekî siltan' çûye Helebê û li karê xwe —elaqedarî ticareta li Helebê ye—vegeriyaye û bi ya sefîr 'Wezîrî Azam' jî Daniel diparêze. Bi qasî me fêm kir, bûyer her wiha elaqedarî Kurdan e jî. Ji nameyeke paşê ya 26'ê Îlona 1743'yan (Mézin 2019b: 84) diyar dibe ku Daniel Misilman e —îfadeya jina wî jî weke wî Misilman e' vê yekê piştrast dike— û meseleyeke ku ela-

Cihgirê konsulê Fransayê li Urfayê, Martin li vir li gundekî Kurd û Ereban e û navê gund weke Medjêrîxan (Medjeri-Khan) hatiye hildan. Wêne di çarçoveya xebateke zanistî ya bi navê 'Mission scientifique de Mr. Ernest Chantre, sous-directeur du Museum de Lyon, dans la Haute Mésopotamie, le Kurdistan et le Caucase' de hatiye girtin. Wênegir Capitaine Barry e û wêne sala 1881'ê hatiye girtin.

Eskerî ji wan sedemên sereke yên xirabûna abora eşîran jî bû. Em bi bîr bixin ku Kilama Memo bi trajediyeke malbatî behsa vê rewşê dike; Memoyê ku Osmanî muhtemelen bi zorê dibin eskeriyê û piştî bi salan vedigere, bi destê dayika xwe tê kuştin: "Jaro lawo, day kore bû, rim danî / Ay hay Memo, serim gihandî canî"



Devehên karwanan ên ku wê ji Çemê Firatê derbas bibin, li Bîrecûgê li benda kelekê ne. Wêne di çarçoveya xebateke zanistî ya bi navê 'Mission scientifique de Mr. Ernest Chantre, sous-directeur du Museum de Lyon, dans la Haute Mésopotamie, le Kurdistan et le Caucase' de hatiye girtin. Wênegir Capitaine Barry e û wêne sala 1881'ê hatiye girtin.

qedarî malbata Longy [Di metnan de her wiha Longi jî dinivîse] ye jî li Helebê heye. Diyar e ku Paşayê Helebê yê Osmaniyan jî ketiye nava meselê (Mézin 2019b: 66, 84). Îhtîmal e ku paşa ji ber dînguherandina Daniel û çawa em ê ji nivîsên paşê tê bigihîjin ya Longy jî, ketibe nava meseleyê. Bi her halî malbata Longy jî Fransî ye; nivîsa pêvek a sefîrê Fransayê ya 26'ê Çiriya Pêşîn a 1743'yan dibêje, nameya konsulê Fransayê yê li Helebê Arasi, li ser mijara birayên Longy gihîştiye û li gorî wê du birayên malbatê li Marsîlyayê dimînin (Mézin 2019b: 92). Û em ji nivîseke din a sefîr a 15'ê Çiriya pêşîn a 1743'yan hîn dibin ku malbatê ji bo parastina xwe, xwe avêtiye bextê muhtemelen serekeşîrekî Kurd —di nameyê de peyva 'şefekî Kurd' hatiye bikaranîn— (Mézin 2019b: 88). Di heman nivîsê de behsa wê yekê tê kirin ku Daniel ji dînê xwe qulibtiye û bûye Misilman. Di nivîseke beriya wê ya 26'ê Adarê de sefîr pêşniyaz dike ku têkiliyên baş tevî karê wî yê xirab jî bi paşayê Osmanî re dewam bikin da ku ev paşayê xwedî hêz nebe dijminê wan (Mézin 2019b: 66).

Nivîsa 15'ê Çiriya Pêşîn a 1743'yan a sefîr ji wezîr re jî heman tiştî piştrast dike. Di vê nivîsê de sefîr gazinan ji wê yekê dike ku konsulê wan ê Helebê Arasi beriya ku malbata Longy xwe biavêje bextê serekeşîrê Kurd li ser meseleyê ev serekeşîr agahdar nekiribû (Mézin 2019b: 88).

Ev mesele paşê jî nivîsên dîplomatîk mijûl dike û bi xwe dilebikîne. Konsulê Fransayê yê Helebê Joseph Arasi ji sefîrê Fransayê yê li Stenbolê Michel Ange re mehekê paşê 14'ê Çiriya Paşî ya 1743'yan dinivîse. Em ji wir hîn dibin ku li ser navê konsulosxaneyê Fonton [Augustin Fonton; têbîniya Mézin e] xebatkar û wergerê konsul e, li Skenderûnê dest bi xebatekê dike li dijî Longy yê xwe spartibû serekeşîrekî Kurd. Di vê nivîsê de em hîn dibin ku dîplomatên Fransayê difikirin ku Longy, Kurdan sor dike li dijî Fransiyan (Mézin 2019b: 91). Em pê dizanin ku hingê di navbera bazirganên Fransî û Ingilîz de bihevnebawerî û reqabeteke mezin jî hebû li ser ewlehiya rê û birêxistinkirina karwanên ji Skenderûnê mal bibin Helebê (bo nimûne binihêre li Türkhan 2014: 84). Dibe ku dîplomatên Fransî ji wê yekê ditirsiyan ku endamên malbata Longy bi Ingilîzan re jî kar bikin. Bi her halî, Fonton lihevkirinekê dibe serî bi malbata Longy re, malbata Longy wê li mala Darbes —ji xebatkarên/nobetdarên embarên li bendera Skenderûnê— bi cih bibe û ji bo malbata Darbes jî malek hatiye peydakirin lê ji bo tamîra wê 1200 qirûş pere lazim in. Di vê nivîsê de jî Kurd weke tehlûke tên dîtin. Ew hêzeke wisa ne ku hinekên din dikarin wan sor bikin. Ev weke tehlûke dîtina Kurdan jî avakirina wan weke ne medenî û hov xurt dike. Meseleya malbata Longy wiha naqede. Di 20'ê Tîrmeha 1744'an de bi nivîseke pêvek, sefîr Michel Ange ji wezîr Jean Frédéric Phélypeaux re radigihîne ku konsul hîna bi meseleyê mijûl e. Sefîr behsa fikarên konsulê Helebê Arasi dike ji ber ku bi hêsanî sifetên 'kaptan' û 'mizakerevanên' fransî dane Longy, "yê ku bi awayekî eşkere xwe avêtiye bextê/parastina Kurdan" (Mézin 2019b: 119).

Weke tehlûke avakirina Kurdan

Em ê li jêr bi rêya têkiliya Daniel û malbata Longy bi Kurdan re bêhtir behsa meseleyê bikin. Lê em niha li behsa Kurdan di van nivîsan de vegerin. Di nivîsa 26'ê Adara 1743'yan de behsa bûyereke din tê kirin: "[B]ûyera din a elaqedarî talankirina karwanekî bi destê dizên kurd". Li gorî nivîsê, Paşayê Helebê tedbîrên lazim ên elaqedarî bûyerê girtine û gavên lazim avêtine (Mézin 2019b: 66). Di vê nivîsê de êdî diz ne tenê diz in, ew 'dizên kurd' in. Em şahidiyê li wê yekê dikin ku di nava kêmtirî pênc salan de di nivîsên dîplomatîk ên Fransayê de 'kurd' ji bo dizan dibe rengdêrek.

Em berê xwe bidin nivîsên dîplomatîk yên mayî yên elaqedarî Kurdan. Nivîsa sefîrê Fransayê Michel Ange ji wezîrê Fransayê yê deryavaniyê Jean Frédéric Phélypeaux re ya 26'ê Îlona 1743'yan, behsa Kurdan jî dike. Lê li vir em dibînin ku diz yan jî talanker weke sifet nehatiye bikaranîn û li şûna wê hatiye gotin "talana bi destê Kurdan". Sefîr, wezîr agahdar dike ku wî ji konsulê Helebê Arasi re ferman şandiye da ku eşyayên wî karwanê bi destê Kurdan hatiye talankirin, vegerîne (Mézin 2019b: 84). Ev jî nîşan dide ku Kurdên diz/talanker, dizên/talakerên kurd di nivîsên fermî de tim û daim nayê bikaranîn. Lê ev nivîs her wiha nîşan dide ku hin kesan serketî beriya vê nivîsê talanê karwanekî rakiriye û dîplomatên Fransayê difikirin ku ew hin kes, Kurd in. Li ser bûyerê em di nava nivîsên dîoplomatîk de rastî belgeyeke din nehatin.

Sefîr wezîrê xwe 2'yê Kanûna 1746'an jî di biwara heqareteke Kurdan li nobetdar û xebatkarên embarên li Skenderûnê de agahdar dike (ibid.: 227). Em pê nizanin ka ev heqaret tiştekî çawa ye lê em tenê dizanin ku "bi destê Kurdan e". Diyar e Kurd weke hêzeke xirakirina îstîqrarê tên dîtin û di van nivîsên dîplomatîk de, meyla elaqedarkirina wan bi dizî û talanê re hêdî hêdî rûdine û dibe ku meseleya Longy jî di vê yekê de bi rolekê rabûbe, lewma ev mesele demeke dirêj sefîr û konsulên Fransî bi xwe diawiqîne.

Piştî mirina sefîr Michel Ange, kontê Alleursê Roland Puchot dibe sefîrê Fransayê li Stenbolê û ew jî hîna bi meseleya Longy mijûl e. Di nivîsa wî ya ji wezîrê nû yê deryavaniyê yê Fransayê, Antoine Louis Rouillé re ya 21'ê Tebaxa 1750'î de (ibid.: 343-344) em dibînin ku ji bo pirsgirêka êrişên 'Kurdan' li dijî embarên li Skenderûnê, projeyeke bicihkirina nobetdar û xebatkarên embaran li Klîkyayê heye û li pêşiya vê projeyê hin astengî hene. Di vê têbîniyê de tê bibîrxistin ku şideta li dijî cihgirêkonsulê [Helebê yê] Fransayê û xebatkar û nobetdarên embaran li Skenderûnê sala 1742'yan cidî bûye û sedema wê bi zorê li Skenderûnê bicihkirina malbata Longy û kirinên Daniel ê ji dînê xwe quliptî bûye. Li gorî vê nivîsê hem Longy û hem jî Daniel ji aliyê "Kurdên Çiyayan" ve dihatin parastin. Yanî ne tenê Longy, lê Daniel jî xwe avêtiye bextê Kurdan û ev Kurd li herêmên çiyayî ne: Bi îhtîmaleke mezin ji ber nêzîkbûna Helebê, behs li ser Kurdên Efrîn, Kilîs û Qiriqxanê ye. Bi her halî di vê têbîniyê de tê bibîrxistin ku peywendiyên herduyan jî bi Kurdan re ji berê ve hebûne. Her çî bûyerên şidetê yên sala 1742'yan in, em di nivîsên beriya hingê de rastî agahiyan nayên. Eynî weke bûyera talankirina karwanekî ku di nivîsa sefîrê Fransayê ya 26'ê Îlona 1743'yan de behsa wezîfedarkirina ji bo vegerandina malê talankirî tê kirin, behsa vê meseleyê jî di nivîsên berdest ên sefîr û konsolos de xuya nakin. Dibe ku ev belge hîna nehatibin katalogkirin yan jî bi awayekî karibin bên xwendin, nehatibin parastin.

12 hezar qirûş av û av çûn

Sefîr Roland Puchot di nivîseke xwe ya 9'ê Çiriya Pêşîn a 1752'yan a ji wezîrê deryavaniyê re behsa 'diziyeke' bi destê Kurdan li ser rêya di navbera Heleb û Skenderûnê de nêzî bajarê Antiyoxê (Antakyayê) dike. Em ê bi nivîsên paşê hîna nû hîn bibin ku qumaş hatine 'dizîn'. Li gorî agahdariyê buhayê malê hatine 'dizîn' 12 hezar qirûş in û vegerandin yan jî tezmînkirina vê zirarê jî zehmet e ji ber ku Paşa [-yê Helebê] felc bûye —di nivîseke paşê de em hîn dibin ku miriye— (ibid.: 414). Tehlûkebûna Kurdan bi gelek awayan êdî ava dibe: Diz, talanker, heqaretvan, çiyayî, parazvanên kesên mesele û yên ji dîn derketî. Em dikarin bihizirin ku bi xwendina rapor û nameyên sefîrê beriya xwe, meyla weke

hov dîtina Kurdan a sefîrê nû ji yê berê zêdetir e.

Elaqedarî 'diziya' dawî ya sala 1752'yan, pêvekeke 10'ê Sibata 1753'yan hin agahiyên din dide. Em hîn dibin ku ku têbîniyeke wergêrê konsulî Charles Fonton ji konsul [Pierre] Thomas re nivîsiye ku komîsyonek hatiye avakirin ji bo tezmîn û qerebokirina zirarên Fransayê yên ji ber "diziya bi destê Kurdan" a sala 1752'yan û gelek belgeyên elaqedarî mijarê jî hatine wergerandin (ibid.: 431). Em ji nivîseke sefîr ji wezîr re ya 1'ê Gulana 1753'yan jî hîn dibin ku ev mesele konsulê Fransayê hîna jî mijûl dike. Di nivîsê de tê gotin, gavên lazim ên qerebokirina zirara ji ber 'diziya' ji Karwanê Heleb-Skenderûnê hatiye kirin, hatine avêtin û tê bibîrxistin ku ev gav û pêvajo ji ber mirina Paşayê Helebê dereng mabûn yan jî nekarîn bên avêtin (ibid.: 431). Sala 1753'yan sê pêvekên naveroka wan ji nêz ve nehatiye diyarkirin lê wergerên belgeyên bi Osmanî ne ên li ser "meseleya diziya bi destê Kurdan" jî ji wezaretê re hatine şandin (ibid.: 431-432). Diyar e ku belgeyên elaqedarî meseleyê jî di ser Izmîrê re hatine şandin. Di nivîsa sefîr ji wezîr re ya 14'ê Gulana 1753'yan de weke belgeyên elaqedarî diziya Kurdan navê wan hatiye hildan (ibid.: 434) Ev mesele wê sefaret û konsolos hîna mijûl bike, çawa em ji nivîseke din a sefîr ji bo wezîr a 15'ê Tîrmeha 1753'yan pê dihisin ku li ser navê Fransayê doza fermaneke nû hatiye kirin da ku zirara qumaşê ku 'Kurdan' 'diziye' were qerebokirin (ibid.: 438).

Ev meseleya 'diziya' bi destê Kurdan di dawiyê de diyar e, dike ku sefîr tercîh bike ku qumaşê hatiye dizîn weke ku bi keştiyekê re binav bûbe, mirov lê binihêre. Di nivîsa xwe ya 17'ê Çiriya Paşîn a 1753'yan sefîr ji wezîr re dibêje, wî êdî ti hêvî nîne ji bo qerebokirin yan jî vegerandina zirara li Fransayê bûye, lewma 'diziya' Kurdan û rasthatina mirina paşayê Helebê di heman demê de kirine ku qerebokirina zirarê nemumkin bibe (Mézin 2019: 453). Di heman metnê de em hevmane bikaranîna "Kurd" û "eşqiya" jî dibînin ku behsa "aciziyên ku ev eşqiya bûne sedem" dike (ibid.). Ev bûyera rakirina talanê karwanekî bazirganiyê jî di nivîsên dîplomatîk ên Fransayê de her weke dizî cihê xwe digire. Li jor me ji bo bûyera din a talanê û hewldanên talanê jî bi bîr xistibû ku ji bo eşîran cudatiyeke mezin heye di navbera dizî û rakirina talanê de. Bi her halî di nava qederê 15 salan de êdî navê Kurd weke hevmaneyê eşqiya hatiye bikaranîn.

Ev behsên elaqedarî hewldaneke 'diziyê' ya 1738'an, talaneke ku muhtemel e sala 1743'yan bûye û 'diziyeke' sala 1752'yan, 'bûyerên şidetê' yên sala 1742'yan yên ku xweşik nehatine zelalkirin, lê em pê dizanin ku cihgirê konsul jî tê de heye, û bûyereke heqareta li Fransiyan hatiye kirin a sala 1746'an û pê re jî weke hêzeke tehlûke —parastina jirêderketiyan, bi ya wan kirin— ya Kurdan li derdora Skenderûnê di navbera 1738 û 1753'yan de dikin ku Kurd weke hov, tehlûke, eşqiya, diz û talanker werin avakirin. Dibe ku nivîsên beriya wê yên dîplomatîk bi vê yekê bi rolekê rabûbin. Lê têkiliya wan dibe ku ne diyarker jî be, ji ber ku em tenê rastî nivîsekê hatin û ew jî depeşeke wezareta karê derve ya 1696'an e. Di vê depeşa wezaretê de mesele ne 'dizî' û talan e, lê "sorkirina Kurdan" "bi destê ingilîzan" û êrişeke encama vê yekê ya li Skenderûnê ye. Wezareta karê derve ya Fransayê 7'ê Adara 1696'an, ji Cihgirê konsulê Fransayê yê li Helebê Joseph Bettandier [yan jî Bétandier] re têbîniyeke kurt dinivîse. Ji vê têbîniya kurt em pê dihisin ku di êrişa Kurdan de cihgirê konsul birîndar bûye û ji ber vê jî ew ê tezmînatê wergire (Taillemite û Henrat [sala weşanê ne diyar e]: 338). Ev nivîs tenê, bêyî elaqeyeke bi dizî û talanê re, nîşan dide ku Kurd her wiha di dawiya sedsala 17'an de jî hêzeke eskerî ne li Skenderûnê û derdora wê, lê ji depeşê agahiyeke em karibin weke tesîreke behsa li ser Kurdan bi isehî wergirin, xuya nake.

Kurdên bêrehm û wehş

Wekî din li derveyî peywenda 'diziyê' jî be elaqedarî avakirina Kurdan a weke hov, sefîr 4'ê Çiriya Paşîn a 1753'yan ji wezîr re behsa çarenûsa Jacques Thomas Simon dike. Li gorî vê belgeyê, ev doktorê tibê yê ku referansa wî [dêra bajarê] Saint-Contest e, serê pêşî nûçeyeke serjêkirina wî belav bûye, lê paşê eşkere bûye ku ew li cem Kurdan maye. Li vir weke têbînî ji bo Kurdan hatiye nivîsîn "miletê bêrehm/xeddar û wehş/zalim". Ew gava vedigere li Diyarbekirê hekîmiyê dewam dike. Li gorî nivîsê, ew dîn bûye. Wekî din behsa meseleyeke deynê mizakerevanê li Helebê [Louis] Dauphin yê li Jacques Thomas Simon jî tê kirin, mîqdara deyn jî hezar û 600 qirûş e (ibid.: 447). Ev nivîs bi rastî jî balkêş e ji ber ku heta niha em meylên dîtina Kurdan weke diz, talanker, tehlûke dibînin, lê ev cara pêşî ye ku ji bo terîfkirina Kurdan hokerên elaqedarî hov û barbaran yanî bêrehm/xeddar û wehş/zalim tên bikaranîn. Ev mesele li vir bi kurtî cih digire, û em heger li peywenda dîrokî ya meseleyê nenihêrin, em ê nizanibin ji bo çi ji bo Jacques Thomas Simon hatiye gotin, "dîn bûye". Ev hekîmê ji tovrindên Fransî, piştî mana xwe ya li welatê Farsan û li nav Kurdan biryarê dide Misilman bibe û navê xwe jî dike Mohamed Rezaî. Esas wî gelek xizmeta oriyantalîzma rojavayî jî kiriye bi berhevkirina destnivîsên bi Farisî [muhtemelen bi Osmanî û Erebî jî] û wî ev destnivîs gihandine nav koleksiyonên Fransî (Beuchot û yên din 1825: 386-387). Gelekî bi aqilan e ku quliptina Jacques Thomas Simon ji Xiristiyaniyê sedem be ji bo ku konsul û sefîr meseleyê weke dînbûna wî bibînin. Tevî ku di behsê de tê gotin li cem wî "miletê bêrehm/xeddar û wehş/zalim" maye, ti agahiya din li ser Kurdan û mana wî li cem wan nayê dayîn. Ev jî nîşan dide ku êdî 1753'yan weke hov dîtina Kurdan adetî bûye, û her wiha tişta din a adetî bûye ew e ku Kurd li derveyî vê hovbûna xwe neyên dîtin.

Ji derveyî peywendê behsa Kurdan

Ji derveyî vê peywendê, sefîr Michel Ange navê Kurdan û Kurdistanê hildide ku elaqeya xwe bi bûyerên êriş û talanê re tine ye. Sefîr, wezîr Jean Frédéric Phélypeaux 22'yê Çiriya Paşîn a 1743'yan agahdar dike ku koalîsyona Tirk û Kurdan li Mûsilê li dijî artêşa Fars bi temamî bi ser ketiye û dorgirtina li Mûsilê şikandiye (Mézin 2019b: 92). Sefîr ji wezîr re 22'yê Sibata sala 1744'an jî radigihîne ku Nadir Şah li Kurdistanê bi pêş dikeve, bêyî ku behsa ti peywendê bike (Mézin 2019b: 102). Artêşa Fars a li jor behsa wê tê kirin jî ya Nadir Şah e û Nadir Şah hingê ji sala 1743'yan û pê ve artêşeke mezin seferber kiribû, dixwest Stenbolê bistîne û ji Hindistanê heta Stenbolê împaretoriya xwe damezirîne. Ji ber wê, ew dorgirtina li Mûsilê bêguman heman dorgirtin e ya ku artşêşa Nadir Şah 4'ê Îlona 1743'yan dabû destpêkirin (Olson 2017: 165-183.). Di vê dorgirtinê de Nadir Şah biraziyê xwe Alî Kulî Xan wezîfedar kir da ku Êzîdiyan qir bike û wî jî zirareke mezin gihand wan (ibid.: 165). 'Bipêşketina' wî ya li

Di nivîsa sefîr ji wezîr re ya 26'ê Adara 1743'yan de behsa '[B]ûyera din a elaqedarî talankirina karwanekî bi destê dizên kurd' tê kirin. Paşayê Helebê tedbîrên lazim elaqedarî bûyerê girtine û gavên lazim avêtine. Di vê nivîsê de êdî diz ne tenê diz in, ew 'dizên kurd' in. Em şahidiyê li wê yekê dikin ku di nava kêmtirî pênc salan de di nivîsên dîplomatîk ên Fransayê de 'kurd' ji bo dizan dibe rengdêrek.



Mirov jî karwanên bazirganiyê jî li Bîrecûgê bi van kelekan ji Çemê Firatê dibihurîn. Wêne di çarçoveya xebateke zanistî ya bi navê 'Mission scientifique de Mr. Ernest Chantre, sous-directeur du Museum de Lyon, dans la Haute Mésopotamie, le Kurdistan et le Caucase' de hatiye girtin. Wênegir Capitaine Barry e û wêne sala 1881'ê hatiye girtin.

Gelekî bi aqilan e ku quliptina Jacques Thomas Simon ji Xiristiyaniyê sedem be ji bo ku konsul û sefîr meseleyê weke dînbûna wî bibînin. Di behsê de tê gotin li cem wî 'miletê bêrehm/xeddar û wehş/zalim' maye. Ev jî nîşan dide ku êdî 1753'yan weke hov dîtina Kurdan adetî bûye, û her wiha tişta din a adetî bûye ew e ku Kurd li derveyî vê hovbûna xwe neyên dîtin.

Ev resmê hanê yê wênesazê Ukraynayî Pyotr Pokarzhev 'siwarê Kurd' nîşan dide. Wêne sala 1890'î hatiye sazkirin.

Kurdistanê ya ku behsa wê tê kirin jî diyar e ku elaqedarî sefera Nadir Şah e, ya ku sala 1744'an jî dewam dikir (ji bo rewşa şer a hingê binihêre li Axworthy 2006: 258-269).

Li şûna encamê

Avakirina weke hov, barbar, eşqiya ya Kurdan li devereke ku erdên wan in û dewletên Osmanî, Ingilîz, Fransa û hinên din jî dest lê werdidin, bi kêra wê yekê tê ku dewlet tedbîrên xwe yên li dijî wan rewa bikin. Me bi peywenda dîrokî hewl da nîşan bidin, çawa di sedsala 18'an de destwerdanên dewleta Osmanî jiyana li deverê serûbinîhev kiriye. Ji ber wê, vegotineke vê dîrokê ya li derveyî Kurdên li deverê ji bazirganiya navneteweyî re tehlûke bûn, yan jî li derveyî bi erênî nirxandina ferzkirina eskeriyê li ser van Kurdan û ji wan standina bacê, lazim e. Di vir de vegotina ku bingehê xwe Kurd û şert û mercên wan bin, wê bibe esas û ne dewletên desthilat û berjewendiyên wan. Li vir ez dixwazim dîsa Retamar bi bîr bixim ê ku digot, sîmbola me Caliban e. Calibanê ku weke sîmbola barbaran, her tişta li dijî çandê hatiye avakirin, sîmbola bindestkirî û bêdengkiriyan e, li gorî Retamar sîmbola paşiyên kolekirî, bindestkirî û xwecihan e. Wê demê em çima nebêjin, talan û êrişên Kurdên ku jiyanên wan weke ku bi temamî bêqedr û qîmet bin bi destê dewletan hatin serûbinîhevkirin, ji kirinên berxwedanê û xwebûna wan in! Ji bo çi em nebêjin, ew gunehê 'diziyê' yê dixin stûyê eşîrên Kurdan bêbextiya desthilatên cuda ye? Gava ku berjewendiyên dewletan bazirganiyeke ewle di ser erd, aborî û civaka van eşîrên Kurdan re ava dikin, bacên giran û eskeriyê li ser wan ferz dikin, hewldana peydakirina aboriyeke alternatîf ne guneh lê berxwedan e. Ji ber wê vegerandina rûmeta wan Kurdên li bakurê Heleb û Reqayê dibe ku ji erkên dîroknivîsandina nû ya Kurdan be. Bi ya min divê em kerameta wan talankerên ji Peyas, Qiriqxan, Efrîn û Kilîsê li wan vegerînin, em bi qedrê wan weke aktorên wê herêmê yên sedsala 18'an zanibin û rûmeta wan li wan vegerînin. Jixwe, ew vê bi her awayî heq dikin ji ber ku wan tirs xistiye nava dilê wan zirhêzên ku bazirganî di ser erdên wan re kirine û jiyanên wan serûbinîhev kirine. Ew bi kirinên weke êriş, parastina dijberan/jirêderketiyan û talanê —belgeyên Fransî navê diziyê lê bikin jî diyar e ku mesele talan e— heyî dibin û esas dibin xwe jî.

Têbînî

(1) Binihêre li wergera helbestê ya di vê hejmara PolîtîkArtê de.

(2) Hêja ye were bibîrxistin ku di The Tempest de cihek heye ku Caliban gava bi Prospero û Miranda re dipeyive heman tiştî dibêje:

We ziman hînî min kir û kara min ji vê
ew e ku ez dizanim nifiran bikim. Qotik bi te bikeve
ji ber ku te zimanê xwe hînî min kir! (Shakespeare 1970: 47)

(3) Tevahiya wergerên jibergirtinan, nivîskarê vê gotarê bi xwe kirine.

(4) Li ser malpera fermî ya arşîva dîplomatîk a Fransayê ev agahî weke agahiyên li ser danûstandinên bi nameyan ên ji Helebê ên di navbera 1733 û 1756'an de hatine dayîn. Navê sefîran û konsulan jî me ji nameyên ku di vê lêkolînê de li wan nihêrî, wergirtin. Li ser heman malpera arşîva dîplomatîk a Fransayê me dikarî wan navan piştrast bikin —herî dawî 26.09.2025'an lê hat nihêrîn—:
https://archivesdiplomatiques.diplomatie.gouv.fr/ark:/14366/8hmxrd71gwzl

(5) Ev agahî hatine wergirtin ji Acipinar 2020: 1-40

(6) Çakar (2020) ji perspektîfa dewletê li meseleyê dinihêre û dibêje, vê lawazbûna dewleta Osmanî rê li ber tevgerên talankeriyê û anarşiyê vekiriye, aramiya deverê xira kiriye û kiriye ku dahata dewletê jî gelekî kêm bibe. Bi ya Çakar sedema siyaseta îskanê ya Osmaniyan a ku li ser Turkmenên deverê hatiye ferzkirin jî ev bi xwe ye.

(7) Binihêre li Sîbera Destanê Kurdî: Elodîno li ser hesabê StêrkTv yê youtubeyê —herî dawî 26.09.2025'an lê hat nihêrîn—:
https://youtu.be/RJj_R7amO1c?si=o5HgoNO_fVcRlN9P

Bi ya min divê em kerameta wan talankerên ji Peyas, Qiriqxan, Efrîn û Kilîsê li wan vegerînin, em bi qedrê wan weke aktorên wê herêmê yên sedsala 18'an zanibin û rûmeta wan li wan vegerînin. Jixwe, ew vê bi her awayî heq dikin ji ber ku wan tirs xistiye nava dilê wan zirhêzên ku bazirganî di ser erdên wan re kirine û jiyanên wan serûbinîhev kirine.

Çavkanî

Acipinar, Mikail. İskenderun İskelesi: Dogu Akdeniz'de Uluslararasi Bir Ticaret Limaninin İnkişafi Meselesi (1589-1612). Di nava Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi, hejmar 44, 1-40.

Axworthy, Michael. (2006). The sword of Persia : Nader Shah, from tribal warrior to conquering tyrant. London: I.B.Tauris.

Beuchot û yên din. (1825). Biographie universelle, ancienne et moderne : ou histoire, par ordre alphabétique, de la vie publique et privée de tous les hommes qui se sont fait remarquer par leurs écrits, leurs actions, leurs talents, leurs vertus ou leurs crimes. Ouvrage entièrement neuf, rédigé par une société de gens de lettres et de savants, Berg 42. Parîs: L. G. Michaud.

Çakar, Enver. (2020). Les Turkmènes d'Alep à l'époque ottomane (1516–1700). Di nava Stefan Winter û Mafalda Ade (Edîtor) Aleppo and Its Hinterland in the Ottoman Period / Alep et sa province à l'époque ottomane (1-27). Leiden û Boston: Brill.

Ferdinand, Malcom. (2019). Une écologie décolonial: Penser l'écologie depuis le monde caribéen. Parîs: Édition du Seuil.

Masters, Bruce. (2020). Power and society in Aleppo in the 18th and 19th centuries. Di nava Stefan Winter û Mafalda Ade (Edîtor) Aleppo and Its Hinterland in the Ottoman Period / Alep et sa province à l'époque ottomane (151-158). Leiden û Boston: Brill.

Mézin, Anne. (2019a). Correspondance consulaire de l'ambassadeur de France a Constantinople, 1709-1790 (2e partie). Pierrefitte-sur-Seine: Archives nationales (France)

- (2019b). Correspondance consulaire de l'ambassadeur de France a Constantinople, 1709-1790 (3e partie). Pierrefitte-sur-Seine: Archives nationales (France)

Moltke, Helmuth von. (1876). Briefe über Zustäude und Begebenheiten in der Türkei aus den Jahren 1835 bis 1839 (Çapa duyem). Berlîn: Ernst Siegfried Mittler und Sohn.

Olson, Robert W. (1997). The Siege of Mosul and Ottoman-Persian Relations, 1718-1743: A Study of Rebellion in the Capital and War in the Provinces of the Ottoman Empire. Richmond: Curzon.

Orhonlu, Cengiz. (1963). Osmanli Imparatorlugunda Aşiretleri Iskan Teşebüssü (1691-1696). Istanbul: İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayinlari.

Raymond, André (1991). Alep à l'époque ottomane (XVIe-XIXe siècles). Di nava Revue du monde musulman et de la Méditerranée, hejmar 62, 93-109.

Retamar, Roberto Fernandez. (1989). Caliban and Other Essays,

Edward Baker (wergêr). University of Minesota Press: Minneapolis.

Shakespeare, William. (1970). The Tempest. Baltimore û Maryland: Penguin Books.

Singh, Jyotsna G. (2003). Caliban versus Miranda: Race and Gender Conflicts in Postcolonial Rewritings of The Tempest. Di nava (205-225). Alison Thorne (Edîtor). Shakespeare's Romance. New York: Palgrave McMillan.

Şimşek, Ali Riza. (2006). Osmanli Ordusunda 18. ve 19. Yüzyillarda Yapilan Islahat Çalişmalari ve bu Çalişmalarda Yabanci Uzmanlarin Rolü (Teza Masterê). Sakarya: Sakarya Universitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Taillemite, Etienne û Henrat, Philippe. [sala weşanê ne diyar e]. Inventaire analytique de la sous-série Marine B/7 (Commerce - Pays

Étrangers - Consulats): Ordres du roi et dépêches ministérielles (1480-1715), tomes 4 à 6. Pierrefitte-sur-Seine: Archives nationales (France).

Türkhan, M. Sait. (2014). 18. Yüzyilda Dogu Akdeniz'de Ticaret ve Haleb (Teza Doktorayê). İstanbul: İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Ana Bilim Dali.

Türkmen, Zekeriya. (1995). Omanlı Devletinde Kapitülasyonkarin Uygulanışına Toplu Bir Bakış. Di nava Osmanlı Tarihi Araştırmaları ve Uygulama Merkezi (OTAM) Dergisi, hejmar 6, 325-341.

Winter, Stefan. (2005). Les Kurdes du Nord-Ouest syrien et l'Etat ottoman, 1690-1750. Di nava Mohammad Afifi et al. (edîtor) Sociétés rurales ottomanes (243-258). Qahîre: IFAO.

- (2017). The Reşwan Kurds and Ottoman Tribal Settlement in Syria, 1683-1741. Di nava Oriente Moderno, hejmar 97, 256-269.

- (2020). Alep et l'émirat du désert (çöl beyliği) au xviie–xviiie siècle. Di nava Stefan Winter û Mafalda Ade (Edîtor) Aleppo and Its Hinterland in the Ottoman Period / Alep et sa province à l'époque ottomane (86-108). Leiden û Boston: Brill.

Winter, Stefan û Ade, Mafalda (edîtor). (2020). Aleppo and Its Hinterland in the Ottoman Period / Alep Et Sa Province à l'Époque Ottomane. Leiden Boston: Brill.

**** Mamosteyê Zanîngeha Rojava li Qamişloyê***

Ev wêne di kitêba bi navê Travels in Koordistan and Mesopotamia ya James Balille Fraser de sala 1840'î li Londonê hatiye weşandin. Fraser wêne sala 1822'yan çêkiriye û navê Şervanê Kurd lê kiriye.

Weke amûreke bikêrhatî hov

Edîtor

Helbesteke navdar a helbestvanê Yewnan Konstantînos Kavafîs yan jî weke bi Ingilîzî Constatntine P. Cavafy heye ku mirov dikare weke 'li benda hovan' yan jî 'li benda barbaran' wergerîne Kurdî. Ev helbest Çiriya Paşî ya 1898'an hatiye nivîsîn û hîna nû 1904'an hatiye weşandin. Ev helbest hem li gelek zimanan hatiye wergerqandin û hem jî bi heman navî feyz daye nivîsandina cûreyên din ên wêjeyî:

- Romana J. M. Coetzee's ya sala 1980'yî (Waiting for the Barbarians). Ciro guerra yekem filmê xwe yê metrajdirêj jî bi heman navî ji vê romanê adapte kir (2019).
- Berhevoka ceribandinên ku sala 1998'an Lewis H. Lapham berhev kirin (Waiting for the Barbarians).
- Berhevoka ceribandinên ku sala 2013'an Daniel Mendelsohn berhev kirin (Waiting for the Barbarians).

Wekî din, Anaal Nathranks di albuma xwe ya di sala 2006'an de straneke bi heman navî bi cih kir, Alexis Taylor navê helbestê li albuma xwe kir (Await Barbarians). Adaptasyonên opera û wênesaziyê jî gelek in.

Helbest weke diyalogekê hatiye avakirin ku kesek ji kesekî xelkê bajarê împaretoriyê dipirse ka çima xelk civiyaye, ka çima împaretor, senato ne li karên xwe ne û wekî din. Kesekî din jî bersivê dide van pirsan. Dr. Murat Issi, mamosteyê zanîngehê û lêkolerê postdoktoral e li Zanîngeha Makedonyayê (Πανεπιστήμιο Μακεδονίας) ya li Selanîkê, ev helbesta Konstantînos Kavafîs ji Yewnanî wergerand Kurmancî.

Ev wêneyê hanê wênesaz A.De Neuville (1836-1885) xêz kiriye, navê wî jî 'Di şerê Şalonê de Hûn' daniye. Ev çîrokeke naskirî ye di nava dîroka kevnar a Fransayê de.

Ev teswîrekî 'barbarekî' Pers e li ser vazoyeke Yewnanistana Kevnar. Li aliyê din ê vazoyê teswîrekî lehengekî Yewnan ê tazî heye ku firaxê mêraniya wî di destê wî de ye. Ji nivîsa li ser vazoyê em pê dihisin ku ew 'lehengê Yewnan' wê dest biavêje 'barbarê' Pers. Li Yewnanistana Kevnar avakirina barbaran, bi kêra rewakirina destavêtina mirovan —çi jin û çi mêr— dihat.
Lînka malpera wêne jê hatiye girtin:
https://www.livius.org/pictures/turkey/koprucay-eurymedon/eurymedon-bottle-3/

Li benda hovan

Em li benda çi ne
li vê Meydana Forumê?

Ew hov wê îro bigihêjin.

Çima li hûndirê Senatoyê betalî heye?
Ji bo çi senator li wir rûniştine
bêyî ku qanûnan çêkin?

Ji ber ku hov wê îro bigihêjin.
Ma ew kîjan qanûnan niha çêkin?
Gava ku hov hatin,
ew ê qanûnan çêkin.

Ji bo çi împaretorê me
ewqasî zû şiyar bûye
Li deriyê herî mezin ê bajêr rûniştiye
Li ser textê xwe, fermî,
bi taca ser serê xwe?

Ji ber ku hov wê îro bigihêjin.
Û împaretor li wir radiweste da
ku qebûl bike
Serekê wan. Ya rastî, wî hazir jî kiriye
Belgeyeke çermî da ku bide wî.
Ya ku li serê
Ji bo wî gelek şan û nav nivîsandî ne.

Çima her du konsulên me
û dadgerên me
Îro ew harmaniyê xwe yê sor û hûnandî li xwe kirine?
Ji bo çi bazinên bi ew çend
aqûtên mor
Û gustîlkên bi zimrûdên beriqandî
bi wan ve ne?
Çima îro ew gopalên binirx ên
erka dewletê bi wan re ne
Ewên xweşik hatine traştin û bi zîv
û zêr nihiçandin?

Ji ber ku hov wê îro bigihêjin.
Û çavên hovan li ber tiştên wilo
kor dibin.

Ji bo çi ew xatibên me yên
herî baş nayên weke caran
Da ku ji xelkê re bipeyivin,
gotinên xwe bibêjin?

Ji ber ku hov wê îro bigihêjin.
Û ew ji rewanbêjî û xîtabên wan
aciz dibin.

Çima niha bi carekê dest pê bike
ev nearamî
Û sergêjî? (Çendî rûyên xelkê cidî bûn.)
Ji bo çi vala dibin rê
û meydan halo bi lez, û
Her kes wilo bifikar diçe mala xwe?

Ji ber ku bû şev û herçî hov in, nehatin.
Û hinek kes gihîştin sînoran
Û wan got, êdî hov nînin.

Û niha, bêyî hovan em çi bikin?
Ew mirovên hanê bi rengekî ji rengan
çare bûn.

Xêzên ku di wergera bi destê Heciyê Cindî ya kitêba Sîras (2012) de hatine bikaranîn.

Di trajediya Memo de rola dewletê

Weke rexneyeke li awayê rûniştî yê veguhestina zanînê ez ê zimanekî bi kar bînim ê ku xwe li 'objektîvîzma mutleq' a ne mumkin danayîne û ji hev cudakirina kirde û tişte hinekî be jî rexne bike. Ez yeqîn dikim ku qebûla subjektîvîzma her lêkolerî û qebûla ku parçekirina kirde û tişte bi kêra hin berjewendiyên diyar tê, dikare şûna îdîaya objektîvîzma mutleq bigire.

Luqman GULDIVÊ*

Kilama Memo vê dawiyê li seranserê Kurdistanê bi albuma Koma Amed a bi navê Dergûş a sala 1997'an bi dengê Memoyê endamê komê belav bû. Helbet em ê li jêr pê dakevin ka esas ev îcra li seranserê Kurdistanê çi qasî belav bûye. Axir piştî 1997'an melodiya wê bêhtir bi kêra govendê dihat û ji ber wê jî bêhtir bi navê stranê belav bû (binihêre li * di qutiya vê nivîsê de). Piştî ku navê dengbêj kete rewacê û belav û maqûl bû, ev yek guherî û peyva kilam (yan jî klam) a ku esas cûreyekî taybet îfade dike, şûna gelek cûreyan êdî girt û me dît ku Strana Memo jî veguherî bû Kilama Memo. Di destpêka salên 2000'î de gava min ji bo doktoraya xwe lêkolîn dikir, ez pê hisiyam ku li herêma îcrayên Memo dihatin kirin —Hekariya û Bohtan—, îcrakerên bi navê dengbêj tine ne û jixwe navê stranê jî ne ji bo cûre, lê ji bo awayê gotinê yan jî bi gotina şairan —îcrakerên esasî yên herêmê— meqamê gotinê dihat bikaranîn. Çawa ku Weliyê Bohtî performansa Sînem Delalê hem weke payîzok û hem jî weke stran dikarî bibêje (Turgut 2010).

Bi vê anektod û vegotinê min dest bi vê gotarê kir ji ber ku ez wê jî dixwazim weke pratîkeke dekoloniyal ava bikim. Ez ê bi variyant û îcrayên cuda yên Memo dakevim. Wan di peywendeke dîrokî de bi cih bikim û lê binihêrim ka dewlet û destwerdanên wê bi roleke çawa radibin. Di heman demê de ez ê berê xwe bidim adaptasyonên edebî jî û bi vî awayî ev gotara kurt bi bikaranîna rêbazên elaqedarî wêjeya devkî, wêjeya nivîskî û rêbaza dîrokî wê înterdisîplîner be. Weke rexneyeke li awayê rûniştî yê veguhestina zanînê jî ez ê zimanekî bi kar bînim ê ku xwe li 'objektîvîzma mutleq' a ne mumkin danayîne û ji hev cudakirina kirde û tişte hinekî be jî rexne bike. Ez yeqîn dikim ku qebûla subjektîvîzma her lêkolerî û qebûla ku parçekirina kirde û tişte nexasim di lêkolînên disîplînên beşerî de bi kêra hin berjewendiyên diyar tê, dikare şûna îdîaya objektîvîzma mutleq bigire.

Ji vir em li îcrayên cuda yên Memo vegerin. Di teza xwe ya masterê de Dîlan Salik gava behsa behreya dengê dengbêjan a avakirina maneyê dike, bi vê stranê jî dadikeve (2019: 77-78). Di vê tezê de em dibînin ku îcrakerên ku Dîlan Salik weke referans nîşan dide, tevî berê cûreyê kilaman li deverê ne belav bûye jî, êdî navê gelek cûreyên cuda yên devkî weke kilam hildidin. Ji ber wê jî ji vê îcrayê re jî dibêjin, Kilama Memo. Axir, Dîlan Salik karekî baş kiriye û em ji wê hîn dibin ku ev îcra li dawetên Hekarî û Bo[h]tan —wê tenê navê bajêr Cizîra Botan nivîsiye, lê em texmîn dikin ku qesta wê li dewrûberê û li herêma Bohtan bi giştî be, çimkî weke herêm behsa wan dike— belav e. Eynî çawa piştî belavbûna albuma Dergûş, li seranserê Ewrûpayê û deverên din ên Bakurê Kurdistanê jî ev îcra veguherî straneke ji bo govendê. Lê ji naverokê jî û ji behsên îcrakeran jî —îcrakerên Dîlan Salik bi wan re peyiviye êdî xwe ji şairbûnê şûştine û bûne dengbêjên hirr— em tê digihîjin ku ev ne stran û ne jî kilam e. Ev zêmara eşkere, dibe ku ji ber meyla li herêmê bi navên cuda jî tê binavkirin: Heger îcrayek li gorî meqaman were gotin, navê wan meqaman li cûreyê wê tê kirin, yanî navê îcrayekêp bi navên cûreyên cuda jî tê hildan. Yanî ya ku Koma Amed di albuma xwe de dibêje, dibe ku stranek be û ya ku sermeselê gorbeheşt Salihê Şirnexî şirove dike jî dibe ku çêra dawetê be. Lê belê esas ev cûre bi naveroka xwe şînî —li deverên cîran weke zêmar tê binavkirin— ye. Nimûneya Sînem Delalê li vir nimûneyeke lê ye. Bi naveroka xwe, ev îcra esas şînî ye. Dayîna Sînemê piştî ku bavê wê, wê dikuje li ser wê dinihurîne. Lê awayê belavbûyî cûreyê payîzok e. Meyla li herêmên Hekariya û Bohtanê ew e ku meqamê îcra pê têkirin, weke merciya dawî ya navlêkirina cûre tercîh bike (ji bo agahiyên berfirehtir binihêre li Turgut 2010).

Dîlan Salik jî ji naveroka —variyantên Salihê Şirnexî û Cemalê Mihê— serwext dibe ku ev şîniyek e, bi Ingilîzî navê zêmarê hildide (ibid.: 77) ku dike em wisa ber bikevin. Salihê Şirnexî, 17'ê Kanûna 2015'an de li Silopiyayê nexweş ket û ji ber ku dewleta Tirk derketina derve li Silopiyayê hingê qedexe kiribû, rehmet kir û çû ber dilovaniya xwedê (Binihêre li ANF 2015). Ji ber wê jî ez qebûl dikim ku Dîlan Salik, ji bo agahiyên li ser 'hîkayetê' li yekê ji qeydiyên deng ên Salihê Şirnexî ên li ser xeta înternetê berdest guhdarî kiriye. Lê belê wê ji 'dengbêj' Cemalê Mihê îcrayek qeyd kiriye.

Salihê Şirnexî beriya îcraya xwe ya esasî, gava agahiyan dide, weke 'hîkayet' behsa van agahiyên xwe dike. Li gorî îcrakerê vê variyantê (binihêre li ** di qutiya vê nivîsê de), bavê Memo ji ber sedemekê ji mala xwe diçe û hîna nû "15, 16, 17, 18" salan paşê nîvê şevê vedigere mala xwe. Lê belê haya wî jê nîne ku gava ew ji mala xwe diçe, hevjîna wî bibar bûye û paşê jê re kurek çêbûye û navê Memo lê hatiye kirin. Gava ku dibîne ciwanekî nûgihayî li malê, nêzî hevjîna wî raketiye, bavê Memo bi gumana ku hevjîna wî bi zilamekî din re bûye, kurê xwe, li gorî Salihê Şirnexî, bi derbên xencerê dikuje. Li gorî vê îcrayê, piştre dayika Memo li ser kurê xwe vê 'kilamê' dinihurîne. Em gava guh didin Salihê Şirnexî,

→

Dayika wî, dibîne li tewlê hespekî boz girêdayî ye û tê di nav nivînan de kurê xwe bi derba soraniyekî dikuje, lewma bi ya wê bi tivingê bikuje, 'deng dikeve dinêyo'. Em li vir xweşik dibînin ku Memê kilama Memê û Eyşê, û Memo yê 'kilama' Memo, heman kes in. Jixwe, Salihê Şirnexî jî qebûl dike ku dayikê derba rimê li kurê xwe daye.

em pê dihisin ku hîna dilê wî xweşik li peyva kilamê rûneniştiye û navê cûreyê lawik jî ji bo vî cûreyî hildide, ji ber ku dilê wî xweşik hîna lê rûneniştiye, di qutiya vê nivîsê de navê îcraya wî min wek Lawika Memo hilda.

Weke me gotî, ev yek ji variyantan e. Di vê variyantê de di naveroka îcrayê de dê jî û bav jî Memo dikujin. Di variyantine din ên ji heman herêmê de diyar e ku dayika Memo wî dikuje. Baş e çîrok çi ye? Çawa dibe ku variyantên ku bav kurê xwe bikuje û dayik kurê xwe bikuje li ser heman îcrayê belav bibin? Mirov dikare bi rêbaza analîza naverokê û her wiha rêbaza dîrokî —peywenda dîrokî dibe ku hin agahiyan bide— li bersiva vê pirsa muhim bigere. Ev pirs muhim e ji bo naskirina rola dewletê û destwerdanên wê jî.

Gava em bi analîza naverokê dadikevin, muhim e ku em bibêjin, Mem Şikakî be, belavbûna vê îcrayê li Hekariya û Bohtan maqûl e, çawa ku îcrayên li ser Elodîno yê Dorikî —ji eşîrên Tora Banî ye— li Bohtan û Hekariya belav in. Yanî mêrên eşîrên herêmên cîran, dibine lehengên mêranî û trajediyên Bohtan û Hekariya. Min ev yek got, ji ber ku îcrakerên van deveran dibe ku ne xwediyê têra xwe agahiyan bin li ser bûyera qewimî. Em ji vegotina Salihê Şirnexî ya beriya îcrayê têdigihîjin ku nakokiyên di navbera agahdariyên ku ew bi 'hikayeta' Memo behsa wan dike û naveroka îcraya esasî de ji bo wî ne giring in. Weke nimûneya herî darîçav, ew dibêje, bav kurê xwe bi derbên xenceran dikuje, lê di îcrayê de eşkere ye ku 'day' yan/û 'bav' Memo bi derba rimê dikuje. Di ferdaya pêşî de Salihê Şirnexî dibêje, "Ay hay Memo, day kore bî, rim danî / Jaro lawo, day kore bû, rim danî" di ferdaya duyem de jî dibêje "Oy hoy Memo, bab kore bî rim danî" (Binihêre li ** ya di qutiya vê nivîsê de). Tevî vê jî di 'hikayeta' Memo de ew dibêje, "Bavê wî dest diavêje xencera xwe, bi dilê xwe çend xenceran dane ser sînga Memo" (2).

Piştî vê, em niha bi îcrayê dakevin. Di îcrayê de di ferdaya pêşî de behsa Romiyan tê kirin: 'Şîr girêda Romiyanî'. Bi ya min, ev rêz di warê têgihiştina peywenda trajediya îcrayên Memo de ya diyarker e. Ji ber ku em li vir dibihîsin ku Romiyan û ew jî di peywenda dîrokî de ji bilî dewleta Osmanî pê ve ne ti kesa din e, 'şîr' girêdaye. Di telefûza Şirnexiyan û bi giştî Bohtan de ev peyv di vê peywendê de bi îhtîmala herî mezin bi maneya 'şêr' hatiye bikaranîn. Bi qasî em ji gotinên 'stranê' yan jî 'kilamê' fêm dikin, Memo mêrekî eşîrê ye. Weke 'Axakê Şikaka' binavkirina Memo bi wê yekê re li hev dike ku ji bo Mem yan jî Memo 'şîr' bi maneya şêr hatibe gotin. Qeydiyeke Evdoyê Kalikî (yan jî Evdoyê Goyî) jî vê qebûla me xurt dike, li wir Memo 'şêrê' serê çiya ye û her wiha 'êriş'ê dibe ser 'Romiyan' jî (3). Ev yek dike ku em di girêdana 'şîr' a di îcraya Salihê Şirnexî de jî çêtir bigihîjin.

Em ê li wê yekê vegerin, ka ji bo çi dibe ku Romiyan ev şêrê Şikakan —dibe ku tenê ji bo qafiyeyê hatibe bikaranîn— girêdabe, lê niha em li naveroka metna îcrayê vegerin. Bi awayekî gelekî muhim, di ferdaya yekem de ne bav lê 'day' kurê xwe dikuje. Ev xisûs giring e, ji ber ku di peywenda dîrokî de tişta ku dike em li meseleyê serwext bin, ew e ku dayika Memo ji bo parastina 'namûsa' mala xwe û ya kurê xwe, mêrê xerîb bikuje. Jixwe, gava em berê xwe didin wêjeya devkî û wêjeya nivîskî, em dibînin, meyl ew e ku Mem —Memê yan jî Memo— bi destê dayika xwe bê kuştin. Îcraya li jor me behsa wê kir ya Evdoyê Kalikî tevî ku ji heman herêma Salihê Şirnexî ye jî nîşan dide ku dê kurê xwe dikuje: Day kore bû nenasî (binihêre li têbînî 3).

Wêjeya devkî û wêjeya nivîskî di nav hev de

Em berê xwe bidin îcrayên Kurdên Qafqasan; ev îcra weke Kilama Memê û Eyşê navdar in û bi rastî jî weke cûreyê kilamê tên îcrakirin (4). Variyantên herî kevin ên ez bi ser ve bûm, di kitêba Folklora Kurmanca ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal de bûn, didu jê bi serenavên 'Memê û Eyşê' (1936: 510-513 û 522-523), yek bi serenavê 'Memê' /(ibid.: 513-516) û yek jê jî bi serenavê Ibrahîm (ibid.: 516-522) cihê xwe di vê berhevokê de digirin. Yên ku ev variyant gotine, sala 1933'yan Gênco Grîgoryan, Hesoyê Mamo —sal nehatiye diyarkirin—, sala 1932'yan Şahên Kuzikyan û dîsa sala 1933'yan Hovhanês Poqosyan in. Di variyanta dawî de Memê heft salan bi îhtîmaleke mezin çûye eskeriyê —qaxeza mîrê dewletê tê û bi ya wê dike diçe xerîbiyê— û gava vedigere, hespê wî yê boz li tewlê tê girêdan û Eyşê Memo dihebîne. Di hersê variyantên din de Memê —yan jî Ibrahîm— heft salan diçe eskeriyê. Di variyanta dawî de dayika wî —Dya pîr— gava ji daweta kurê padişê vedigere, dibîne li tewlê hespekî boz girêdayî ye û tê di nav nivînan de kurê xwe bi derba soraniyekî —sîlehek e tûj e, dibe ku, xencer, şûr yan jî rim be— dikuje, lewma bi ya wê bi tivingê bikuje, 'deng dikeve dinêyo' (ibid:522-523). Di variyanta sêyem de (ibid.: 516-522) dayik bi rimê kurê xwe dikuje. Em li vir xweşik dibînin ku Mem ê kilama Memê û Eyşê, û Memo yê 'kilama' Memo, heman kes in. Jixwe, dengbêjê me Salihê Şirnexî jî qebûl dike ku dayikê derba rimê li kurê xwe daye (binihêre li ** di qutiya vê nivîsê de). Wekî din hespê boz ê Memê û çûna wî ya bi xerîbiyê ve û mana wî ya demeke dirêj jî di wan de hev digirin. Di variyanta Salihê Şirnexî de ew xweşik berneketibe jî 'Romiyan' 'şîr [şêr]' girêdaye û ev jî nîşan dide yan dewleta Osmanî Memo girtiye, xistiye hepsê yan jî ew biriye eskeriyê. Lê di sedsala 18'an û 19'an de zêde ferqa girtinê û çûna eskeriyê jî ji hev nebûye (binihêre li nivîsa Avakirina Kurdên eşqiya di nivîsên dîplomatîk ên Fransî de ya di vê hejmara PolîtîkArtê de). Di variyanta dawî ya di Folklora Kurmanca de Mem bi dilê xwe diçe wezîfeya 'mîrê dewletê' bike, lê di her sê variyantên din de ew diçe eskeriyê. Di adaptasonên wêjeyî de jî navê wî li nava lîsteya kesên wê biçin eskeriyê tê zêdekirin. Ji ber ku Memê 7 salan diçe eskeriyê, li gorî vê variyantê, kilam bi îhtîmaleke mezin behsa bûyereke piştî hilweşîna ocaxa yenîçeriyan (1826) dike. Lê beriya wê jî bêserûber birina eskeriyê di sedsala 18'an de li nava Osmaniyan dest pê kiribû û xelk bi dehan salan jî dibirin eskeriyê (binihêre li nivîsa Avakirina Kurdên eşqiya di nivîsên dîplomatîk ên fransî de ya di vê hejmara PolîtîkArtê de). Variyanta Mecîdê Xalit dibêje jî ne zêde cuda ye. Lê belê navê dê 'Wetê' tê hildan û ew ji daweta kurê padişê venagere. Sibehê zû şiyar dibe û trajediya em dizanin diqewime.

Di variyanta Salihê Şirnexî de di ferdaya dawî de gotineke din a muhim heye ji bo em karibin çêtir ji peywendê fêm bikin: "Sebra Memo pîroz e" (binihêre li ** di qutiya vê nivîsê de). Li vir kesê sebr dike Memo ye û sebra wî jî pîroz e. Bivênevê em ji xwe dipirsin, heger Memo kurê bavê kujer be, ji bo çi ew xwediyê sebra pîroz e? Yanî îhtîmala ku Memo piştî 7 yan jî '15, 16, 17, 18' salan vegeriyabe mala xwe û bi hevjîna xwe yan jî bi Eyşê re kêf û şahî kiribe û ji wê mohleta bihurî re sebra pîroz a Memo hatibe gotin, zêdetir e ku ji sebra dîtina bavê xwe ya kurê '15, 16, 17, 18' salî re hatibe gotin. Gava em berê xwe didin dengbêjekî din yê ji heman deverê, Kerîmê Jîrkî, em dibînin ku di 'hîkayet'ê de ew jî dibêje, Memo 7 salan eskeriyê dike û vedigere, dê kurê xwe nas nake û wî dikuje. Wekî din variyantên din ên ji heman herêmê jî îşaret pê dikin ku dê kurê xwe Memê kuştiye (5).

MƏME U ƏJŞE

Məmejo, mən işəv xwənək dijo,
Kaoləzəki hati əb Məmejo;
Kaoləz, kaoləza mire dəwlətejo,
Məme xatər xast əb malejo,
Cu wəlate də xəribejo.

Həft sale Məme mən təmam bijo,
Xatər xasti əb padşejo;
Sjar bu lə Bozejo,
Bəre xwə də wəlate mali babejo.

Hat lə bər dəre mali babe pəja bijo,
Gazi kəri:—Le, le, Əjşejo,
Mevanə, mevane xwədejo.

Əjşe gazi kəri:—Hərkə ty mevani,
Mevane də xwədejo,
Həspe xwə bəksin təwlejo,
Ty wərə hərə alije də odejo,
Əze əb tərə binəm nane də qəwejo,
Həspe tərə binəm çəhe də kəjejo.

Məme gazi kəri, got:
Əz Məme mə,
Sing u bəre teli Əjşe mə,
Əjşe dəri vəkər lə Mamejo,
Kylav u doşək raxəstijo,
Əb xwərə kərən kef u səjrangə
Həja bərbanga də əbejo.

Məme goti:—Ka dja pirejo!
Əjşe got:—Djapire, iro dy roz, se roz cuja
dəwata kyre pədəşejo.

Əbe zuda tejo.

Dja pire hati əb dəwata kyre də pədşejo,
Hati, cu, alije təwlejo,
Nəheri həspəki bozi gəredajo,
Hati cu alije də odejo,
Nəheri xortəki cardə sali də pəşəla teli Əjşejo.

Got:—Puh, nəhləl, mərəve də isano,
Cawa ani kyre xəlqe kərə pəşla xwəno,
Pire got:—Əze təfənge lexəm,
Dəng dəkəvə dənejo,
Ərke soraniki lexəm qəwata də əznejo.

Rabu dja pir sorani dani sər dəl u gyrçəke
də Məmejo,

Xwə avit sər sorani,
Car təli peci cu lə ərdejo,
Qirin kəti də Məmejo,
Çarin kəti də Əjşejo.

Got: Hovhanes Poqosjan, əb gynde Avane lə sər nəbja Aştarake.

Nəvisin: H. Çəndi u Ş. Kuzikjan, də wəxte ekspedisia 1933 sale bə sərkaria prof. K. M. Ohançanjan.

LƏJL U MƏÇRUM

Nave bave Məçrum Məhməd Əmin bujə, bə xwə si kyrmanç, nave dija wi Əjne bujə.

Məhməd Əmin sjar dəvə həspe xwəji bozi gyli Şamejə,
Bəre xwə dədə rasta əorən rave u neçirejə,
Qum lə kape həsnejə,
Le dənerə, obəke təzə hatijə lə wejə,
Konəki lə vezejə,
Cit u pərde wi koni öçəmijə,
Stunəkə peşijejə.

Stuna peşən zivijə,
Qizəkə bənə wi konijə,
Dəv u əran qydrətijə,
Navməla cəl u car kəzijə,
Hər gylike mrçanək qiməti pevajə.

Məhməd Əmin dələki nə, həzar dəli əb xwərə əşq bujə,
Dəcə, xwə bave xwərə dəgəhinə,
Bave wi le dənerə məde Məhməd Əminə le tyninə.



Di çapa pêşî ya Folklora Kurmanca de serhatiya Memê û Eyşê.

Di çarçoveya avakirina zanînê bi çavkanî û jêderên ji nava civakê, pêdivî pê heye ku rola dewletên Osmanî, Sefewî û yên din di trajedî û felaketan de ji nû ve bê nirxandin, û nihurandina van şîniyan yan jî zêmaran bi cûreyên cuda ji nû ve di peywendeke berxwedana li dijî dewletê de were danîn.

Xêzên ku di wergera bi destê Heciyê Cindî ya kitêba Sîras (2012) de hatine bikaranîn.

Tesîrên serhatiyê li wêjeyê

Ev kilama ku ji destanan tê hesibandin, ji bo adaptasyonên edebî, pêşî diyar e bala nivîskarê Ermen Sîras kişandiye. Wî ev serhatiya Memê û Eyşê weke romaneke kurt nivîsiye. Lewma di wergera bi destê Heciyê Cindî ya berhemê ya ku sala 1935'an ji nava Neşra Hukumetê [ya Ermenistana Sovyetê] derket, weke navê cûre, li ser kitêbê 'roman' dinivîse (Sîras 1935). Di vê romana ku xwe disipêre kilama di nav Kurdên Ermenistanê de tê gotin, Memê heft salan çûye eskeriyê û rojekê ji dehma ve tê û dibe mêvanê hevjîna xwe Eyşê. Tevî ku Memê ji Eyşê dixwaze mizgîniyê bide dayika wî jî, Eyşê dibêje, "bihêle dayka pîre-reben îşev rehet razê" (Sîras 2012: 16). Jixwe bi vî awayî bêxeberhiştina dayikê, dibe sedema destpêka wê felaketa ku trajediyê ava dike: Dayika Memê, Zozan bi soraniya (6) kurê xwe, kurê xwe dikuje (ibid.: 23) û gava Eyşê şiyar dibe û jê re dibêje, 'Wey Dayê te çi bi serê me kir?' hîna nû bi xwe dihise ku kurê xwe kuştiye (ibid.: 25).

Vê serhatiyê wekî din îlham daye Taharê Biro jî ku şanoyekê binivîse (1991; di agahiyên di berga paşê ya kitêbê de dibêje, nivîskar piyesa xwe 1967'an nivîsiye). Di vê şanoyê de ya ku ji pênc qewimandinan —ji bo act di şanoyê de hatiye bikaranîn— pêk tê, navê dayika Memê ne Zozan e lê Wetê ye, eynî weke di îcraya Mecîdê Xalit de; lê dibe ku wî navê di 'poêma' Xelîlê Çaçan Muradov de ji bo şanoya xwe tercîh kiribe. Ev zeneke maqûl e jî ji ber ku heger wî piyesa xwe 1967'an nivîsîbe, bi rehetî mumkin e ku wî poêma 1965'an derketî ya Xelîlê Çaçan Muradov xwendibe. Tişta balkêş di şanoyê de ew e ku Taharê Biro gund û karakterên çîrokê weke Êzîdî ava kirine, lewma karakterên Şêx Hacî weke '[ş]êxê gund' û Pîr Emîn weke '[p]îrê gund' ji bo vê yekê delîl in (ibid.: 4). Karakterê Zabitê Romê yê ku di qewmîna d[i]duyan de dikeve nava şanoyê de dibêje, "[h]ûn baş zanin, wekî her sal em cahila dibin eskeriyê" (ibid.: 67) û li vir xweşik bi Kilama Memo ya Salihê Şirnexî re li hev dike: "Şîr girêda Romiyanî". Axir di şanoyê de piştî ku Pîr Emîn navê wî hildide (ibid.: 72), tevî hewldanên Xelîl, Xişman û Etar li mala Casim Begê li cem Zabitê Romê jî, Memê dibin eskeriya Romê (ibid.: 97). Gava nivîskar şanoya xwe ava dike bi îhtîmaleke mezin ji îcrayên devkî hin qisman jî li nava çîrokê bi cih dike, çawa gava ku Zabitê Romê dibêje, dewleta wî serwer e li Kurdistanê:

Nîşanê dunê erd û ezman e,
bifikirî roj û şevan e,
sal heye sêsid şêst şeş rojan e,
destê padişê me ser Kurdistan e.
(ibid.: 81)

Bi heman rengî, di qewmîna pêncan de ew cihê qedera serhatiyê diguhere, yanî cihê ku Eyşê mizgîniya xêrê ji dîtira rojê re dihêle û dibe sedem ku dayik Wetê, kurê xwe Memê bikuje jî ji îcrayeke devkî muhtemelen hatiye girtin:

Berbangê, çaxê hişyar bû, ezê mizgîniyê
bidim w[ê] û bêjim:
"Hespekî boz li tewlê ye,
Z[î]nê Erebî li piştê ye,
Hatiye kurê te Memê ye!"
(ibid.: 153)

Diyar e ku Xelîlê Çaçan Muradov jî ji variyantên devkî ji bo helbesta xwe sûd wergirtiye. Li ber destê min çapa vê helbestê ya tevî wergera Tirkî heye ku rojnameya 'Tevkari' ew weşandiye. Mixabin li ser berga weşanê tenê bi Tirkî 'Memê ile Eyşê' dinivîse weke serenav. Ji ber ku ti sal nehatiye hildan, lê rojnameya Tevkari bi qasî em pê dizanin sala 1982'yan hatiye weşandin û ew jî li bajarê Duisburgê —Elmanya— derketiye, em dikarin wisa bihesibînin ku ev berhem jî bi tîpên latînî ewilî sala 1982'yan hatibe weşandin. Em nizanin gelo ti hejmarên din ên rojnameyê hîna parastî mane yan na, lê hem li Kitêbxaneya Kurdî ya Stockholmê tenê yek weşana/hejmara wê heye û hem li Kitêbxaneya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî tenê ev berhema Xelîlê Çaçanê Muradov heye ji hejmarên vê rojnameyê. Di têbînîyê de em dibînin ku weşanker jî weke nivîskar navê 'poêm' li berhemê kiriye û gotiye, ew 'sertaca literatura' Kurdên Sovyetê ye (1982: bi destnivîsê 3). Di tîpguhêziyê de gelek xeletî hebin jî mirov van xeletiyan nas dike û di berhemê digihîje. Axir navê 'poêm'ê Xelîlê Çaçan Muradov bi xwe li berhema xwe kiriye bi serenavê 'Du poêm: Destanên Memê û Eyşê û Zembîlfiroş' (1965). Ev kitêb bi tîpên latînî paşê ji aliyê Weşanên Lîsê ve ji nû ve hatiye çapkirin (Muradov 2015). Di vê 'poêmê' de pêşî çîroka sêwîmana Memê tê gotin, ka çawa Wetê ya dayik ew mezin kiriye (1982: 3-4). Piştî wê xwestina Eyşê û zewaca pê re tê vegotin (ibid.: 5-8) û em dibînin ku Xelîlê Çaçan Muradov Memê xwe Misilman ava kiriye: "Paşê melle nehıkê dıbıre" (ibid.: 8). Bi xirabiya axê, yê ku li ser "fermana padşê Roma Reş" xortan Memê jî di navê de dibe (ibid.: 8), Memê bi miradê xwe şa nabe û 7 salan wî dibin eskeriya li Şamê (ibid.: 9). Di vê adaptasyona edebî de, Xelîlê Çaçan Muradov di dawiyê de gava ku dê kurê xwe dikuje (ibid.: 13), di poêma xwe de dayikê dîn dike bi çiyê dixe û dike ku ew jî xwe ji tehtekî de bavêje û bikuje. Eyşê jî bi heman soraniya ku dê kurê xwe pê kuştiye, xwe dikuje (ibid.: 15). Bi vî awayî şair trajediyeke temam ava dike. Em dibînin ku di poêmê de jî û di şanoyê de jî dewleta Osmanî sebeba xirabiyan be jî, fîgurên ji nava gund ên weke axayê gund yan jî Pîr Emîn jî sersebeb in ku ev xirabî biçin serî. Yanî lome ji dewletê zêdetir ji hevkarên wê tê kirin. Ji ber ku ev her du adaptasyon jî yên serdema Sovyetê ne, em texmîn dikin ku rola perwerdeya di Sovyetê de jî di avakirina bi vî awayî de bi rolekî rabûbe. Lê li derveyî vê jî di wêjeya devkî ya Kurdî de weke motîf jî bêbextiya axa û mîran heye, çawa di serhatiya Eliyê Mamed û Seyrê de mezinê eşîrê Îskanê Gulîxanê bêbextiyê li Eliyê Mamed û Seyrê dike (binihêre li Cizîrî 45-46).

Trajediya Memo hewarek e li dijî dewletê

Destwerdana dewletan li jiyana eşîran ji felaketên herî mezin ên sedsala 18'an û 19'an in li Kurdistanê. Gelek qewmînên ku şahidiya vê yekê dikin, hene. Di vê hejmarê de nivîsa 'Avakirina Kurdên eşqiya di nivîsên dîplomatîk ên Fransî de' jî bi hinan ji van destwerdanan dadikeve. Lê di nava van destwedanan de yek ji yên herî xedar, siyaseta rakirina eskeran ji nava eşîrên Kurdan e. Serhatiya Memo yan jî Memê şahidiya vê yekê dike ku bi awayê herî trajîk ê mumkin, nîşan dide ka ev felaketeke çawa ye: Dê bi destê xwe kurê xwe dikuje.

Lê belê tevî ku di edebiyata Kurdên Sovyetê de bi cûreyên şano û şiir, û bi şêweyê pexşanê jî bi wergereke ji Ermenî cihê xwe girtibe jî weke destanên din, nekariye belav bibe. Yek ji sedeman ew e ku variyantên li bakurê Kurdistanê tenê weke îcrayên muzîkî mane û gelek îcraker jî bi çîroka serhatiyê nizanin. Em di nimûneya Salihê Şirnexî de jî pê dihisin ku îcraker serê xwe bi nakokiyên 'hîkayeta' xwe û îcraya xwe naêşîne û wekî din bi rola dewletê ya di îcrayê de jî di 'hîkayeta' xwe de danakeve: Çûna Memo bi zora 'Romiyan' e, lê di hîkayetê de behsa wê nayê kirin.

→

Bi vî rengî em dikarin bi hêsanî bibêjin, di çarçoveya avakirina zanînê bi çavkanî û jêderên ji nava civakê, pêdivî pê heye ku rola dewletan (dewletên Osmanî, Sefewî û yên din) di trajedî û felaketan de ji nû ve bê nirxandin, û nihurandina van şîniyan yan jî zêmaran bi cûreyên cuda ji nû ve di peywendeke berxwedana li dijî dewletê de were danîn. Bi vî awayî wê avakirinên nû yên edebî jî di çarçoveyeke xwebûnê de xurttir û manedartir bibin.

Têbînî

(1) Di vîdeoya li jêr de —herî dawî 28.09.2025'an lê hat nihêrîn— ji saniye 23 ta saniye 29:
https://youtu.be/nAtGQRa3Xds?si=_ZI3FfXQirNZAsoj

(2) Di qeydiya li jêr de —herî dawî 26.09.2025'an lê hat nihêrîn— ji 1 deqîqe û 26 saniye ta 1 deqîqe û 33 saniye: https://music.youtube.com/watch?v=8rjyLjVA4do&si=64dMvaWp-hE6r9xx

(3) Binihêre li —herî dawî 26.09.2025'an lê hat nihêrîn—: https://youtu.be/xWtanHvxWFE?si=WHJ7vBxPMaRAJJ3j

(4) Sermeselê binihêre li îcraya Mecîdê Xalit a di Radyoya Êrîvanê de li ser hesabê Deutsch Kurdisches Kultur Institute yê music youtubeyê, yê ku me 26.09.2025'an lê guhdarî kir:
https://music.youtube.com/watch?v=kJJLn1S9yl0&si=6GvU7ja8xZvQRIsd

(5) Ji bo îcraya Kerîmê Jîrkî binihêre li —herî dawî 30.09.2025'an lê hat nihêrîn—:
https://www.youtube.com/watch?v=FaYhtbV0i7E
Ji bo yên din li ser platformên dijîtal bo nimûne binihêre li variyantên Remezanê Silopî, Mesût Cizîrî yan jî Seyid Goyî dibêjin.

(6) Diyar e navê sîleheke siwaran e. Ji peywenda romanê, em pê dizanin ku navê sîleheke tûj e û bi îhtîmaleke mezin xencereke taybet e.

Çavkanî

ANF. (28.12.2015). Li Botanê Roboskiya duyemîn: 2 jê pitik 33 sivîl hatin qetilkirin. Herî dawî 26.09.2025'an lê hat nihêrîn: https://kurmanci.anf-news.com/kurdistan/li-botane-roboskiya-duyemin-2-je-pitik-33-sivil-hatin-qetilkirin-53646

Biro, Taharê. (1991). Memê û Eyşê: Şano. Bruksel: Enstituya Kurdî ya Brukselê.

Cindî, Heciyê û Evdal, Emînê (Berhevkar û Amadekar). (1936). Folklora Kurmanca. Êrîvan: Neşra Hukumata Ermenistana Sêwrê.

Cizîrî, Şerefxan. (1998). Seyra Gulîsor. Di nav Nûdem, hejmar 26, 40-53.

Muradov, Xelîlê Çaçan. (1965). Du poêm: Destanên Memê û Eyşê û Zembîlfiroş. Êrîvan: Neşra Hikûmetê.
- (1982?). Memê ile Eyşê. Di nava Tevkari, hejmar 1.
- (2015). Mem û Eyşê & Zembilfiroş. Amed: Weşanên Lîs.

Salik, Dîlan. (2019). Voice as a Space of Memory and Sonorous Object in the Dengbêj Tradition (Teza Masterê). Stenbol: Bogaziçi Universitesi.

Sîras. (1935). Memê û Eyşê (Wergêr: Heciyê Cindî). Erîvan: Neşra Hikûmetê.

- (2012). Memê û Eyşê (Wergêr: Heciyê Cindî). Wien: Pirtûkxaneya Casimê Celîl.

Turgut, Lokman. (2010). Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekarî. Berlîn: Logos.

**** Mamosteyê Zanîngeha Rojava li Qamişloyê.***



Strana Memo*

Hoy hoy hoy Memo,
Mem Ebasî Ebasî
Jaro dilo Memo, Mem Ebasî, Ebasî
Hoy hoy hoy Memo,
Mem Ebasî Ebasî
Jaro dilo Memo, Mem Ebasî, Ebasî
Hoy hoy hoy Memo,
kurtekî ser kirasî
Jaro dilo Memo, kurtekî ser kirasî
Hoy hoy hoy Memo,
kurtekî ser kirasî
Jaro dilo Memo, kurtekî ser kirasî

Hoy hoy hoy Memo,
Memê'm tê ji Diyarbekir
Jaro dilo Memo,
Memê'm tê ji Dîyarbekir
Hoy hoy hoy Memo,
wî anî barek şekir
Jaro dilo Memo, wî anî barek şekir
Hoy hoy hoy Memo,
tîrê cergê duker kir
Jaro dilo Memo,
tîrê cergê duker kir

Hoy hoy hoy Memo,
hespê Memê min boz e
Jaro dilo Memo,
hespê Memê min boz e
Hoy hoy hoy Memo,
meydanê dike toze
Jaro dilo Memo,
meydanê dike toze
Hoy hoy hoy Memo,
sefer dayikê pîroz e
Jaro dilo Memo,
sefer dayikê pîroz e

Hoy hoy hoy Memo,
Mem Ebasî Ebasî
Jaro dilo Memo, Mem Ebasî, Ebasî
Hoy hoy hoy Memo,
kurtekî ser kirasî
Jaro dilo Memo, kurtekî ser kirasî

Lawika Memo**

Ay hay*** Memo, Memo, Memo,
Memyanî
Jaro lawo, Memo, Memo, Memyanî
Ay hay Memo, şîr girê da Romiyanî
Jaro lawo, şîr girê da Romiyanî
Ay hay Memo,
day kore bû, rim danî
Jaro lawo, day kore bû, rim danî
Ay hay Memo, serim gihandî canî
Jaro lawo, serim gihandî canî

Oy hoy Memo, Ebasî xweş Ebasî
Jaro lawo, Ebasî xweş Ebasî
Oy hoy Memo, kurtekî ser kirasî
Jaro lawo, kurtekî ser kirasî
Oy hoy Memo, bab kore
bî rim danî
Jaro lawo, serim giha peresî

Oy hoy Memo, Mem axakê Şikaka
Jaro lawo, Mem axakê Şikaka
Ay hoy Memo, berxa rakin
ber maka
Jaro lawo lê, berxa rakin ber maka
Ay hay Memo, bab kore bî rim danî
Jaro lawo, serim giha mîlaka

Oy hoy Memo,
mehnê Memiya mi boz e
Jaro lawo, caniya lawê min boz e
Oy hoy Memo, li derê malê kir toze
Jaro lawo, li derê malê kir toze
Oy hoy Memo, sebra Memo pîroz e
Jaro lawo, sebra Memo pîroz e

* Bi rengê di albûma Dergûş a Koma Amed de tê gotin.
** Gelek vîdeo û qeydiyên ku tê de Salihê Şirnexî behsa hîkayetê dike li ser youtube û music youtube peyda dibin. Me agahiyên xwe 26.09.2025'an ji vê qeydiyê girtin: https://music.youtube.com/watch?v=8rjyLjVA4do&si=64dMvaWp-hE6r9xx Em bi rehetî nas dikin ku Ali Dogan Gunultaş ji ber Salihê Şirnexî girtiye, lê li gelek tiştan xweşik serwext nebûye.
*** Carinan weke 'Oy hoy', carinan weke 'Ay hoy', carinan weke 'Ay hay' jî bi lêv dike.

...

li vî welatî, li serê van çiya
doh şaqî bûm, îro eşqiya
li navekî geriyan bo qetla min
di ferhenga wan de ez: xayînê duhî
geh terorîst im, geh qaçaxçî!

...

Arjen Arî